Weizsäcker'ci "tıbbî antropoloji"nin temel arzusu, modern tıbba "özne"yi getirmekti. Schiltenwolf, hastanın özne olarak ulaşılıp "birlikte oynayan oyuncu" olarak kazanılması gerektiğinden söz ettiğinde bu Heidelberg geleneğini ileriye taşır. Psikosomatik bir ağrı hastalığı durumunda hemen ve radikal bir biçimde ilaçla müdahale edilirse, hastanın herhalde, burada belki de organik olana aktarılan psişik veya psiko-sosyal sorunları ele alıp çözme şansına sahip olur. Ruhsal ya da bedensel semptomların bir anlamının olduğu, müteessir insanın hayat yolunda anlamlı bir olay olarak anlaşılabilecekleri ve belirli psikososyal yükümlülükler, çatışmalarda temellenebileceğini ortaya çıkarma, modern psikoterapinin büyük keşfiydi.

Analizi ve terapisi modern psikoterapi için yol gösterici olan ilk hastalardan biri, kadın ağrı hastası Elisabeth von R. idi. Sigmund Freud'a başvurduğunda, gittikçe daha fazla bir şekilde yürümesini imkansız kılan bacaklarındaki kuvvetli ağrılardan şikayet ediyordu. Bu ağrılar ilk belirdiğinde durum nasıldı? Elisabeth, annesiyle, ağır hasta olan kız kardeşi ve onun kocasıyla yaz tatilinde bulunmuştu. Elisabeth'in kendisi, eniştesini seviyordu ve itiraf edemedi, çünkü kız kardeşine çok düşkündü. Hastalığın ortaya çıkışını, açık bir şekilde semptomlara yol açan doğrudan iki durum

öncelemişti. Üçünün gideceği şekilde planlanan bir gezinti esnasında kız kardeşi, hastalığından dolayı birlikte gelemedi, öyle ki Elisabeth, "sevgili" enişteyle yalnız idi. "... adamın söylediği her şeyle çok uyumluydu ve tam da ona denk gelen bir adama sahip olma isteği, Elisabeth'te karşı konulamaz bir hal aldı". Bu olaydan kısa bir süre sonra, yoğun bir biçimde artan şikayetler baş gösterdi ki bu şikayetler, kısa bir zaman önce rahmetli olan kız kardeşinin yatağında bulunduğunda ve aklından "şimdi serbestsin, karısı olabilirsin" düşüncesi geçtiğinde oldu. Devam eden çatışma burada bulunur: "Bütün ahlaki tasavvurlarıyla çatışan erotik bir tasavvur döngüsüydü, zira eğilim, eniştesiyle ilişkiliydi ve kız kardeşinin hem hayatta olduğu dönemlerde hem de ölümünden sonra, bu adamı özlediği, çirkin bir düşünceydi". Semptomun ortaya çıkışı, artık şöyle açıklanabilir ki, "(içinde çatışmaya sebep olan) biriktirdiği ruhsal ağrıların yerine" (bütün çatışma gibi ruhsal ağrılar, büyük ölçüde bilinçdışı kalmıştı), şimdi de bu ağrılar "bedensel" olarak ortaya çıktı. "Öyle bir dönüşüme girildi ki bu dönüşümde, hastanın kendisini dayanılmaz bir ruhsal durumdan uzaklaştırdığı, ancak bunu ... bedensel bir acı, (yürüme kabiliyetinden mahrum olmasına yol açan) ağrılar pahasına yaptığı kazanç olarak belirir" (Freud ve Breuer 1895).

Burada yardım sadece, bu ağrı semptomuna yol açmış olan arka planının ele alınıp işlenmesiyle mümkündü. Shakespeare ile beraber şu söylenebilir: "Ağrına şu sözü ver: Konuşmayan keder, dolu kalbini, kırılana dek sıkar" (krş. Lang 2000b). Burada Freud ile kadın hasta arasında gelişen söyleşi, "Söz'ün şifa getirici gücü" (Gadamer 1993, s. 173) sayesinde

terapi olarak kendini gösterdi.

Bu arada psikosomatik ağrı, sadece burada gösterilen dönüşüm mekanizmasıyla değil, aynı zamanda psiko-vejetatif korelat ya da eşdeğer olarak ortaya çıkar.

Her yerde bulunan bir fenomen olarak ağrı, çeşitli klinik belirmelerde, vejetatif gerilim durumlarına yol açabilir ki bu durumlar o zaman korelat olarak klinik resmi belirler. Korku ve endişe duygusuna eşlik eden fizyolojik süreçlerden hareket eden bu "somatisazyon", o kadar ileri gidebilir ki müteessir insanın beyninde bizzat korku kaybolur. O zaman artık bir korku korelatından değil de, aksine korku eşdeğerinden söz ederiz. Seyrek olmayacak bir şekilde mesela baş ağrıları, bu patopsikolojik veya patofizyolojik temelde açıklanabilir (krş. Ahrens ve Egle 1993).

Daha az olmayacak bir biçimde ise, böyle bir psiko-vejetatif ağrı rahatsızlığı depresif form döngüsünü ilgilendirebilir ve burada özellikle duygu eşdeğerliliği anlamında olur ki bu münasebetle bedensel semptom, yani beden ağrısı, bizzat kendisi ya da sadece pek az algılanan depresif duyguyu "temsil eder". Bundan dolayı "gizli depresyon"dan söz edilebilir (Krş. Lang 2000a). Hekim için burada, depresyona sebep olan faktörleri belirlemek, "ağrılı" depresyonun psikodinamiğini incelemek zorunlu olacaktır. Fantom ağrıları belki de bu şekilde bir nebze daha iyi anlaşılabilir. Niemann'ın örneği, bu durumu daha açık gösterebilir:

"48 yaşında kadın bir hasta, fantom ağrısıyla, ayakta tedaviye gelir ve tipik olarak anlatılan ağrıların yayında, bacağın kaybedilmesine ilişkin üzüntünün de bir rol oynamış gibi göründüğü anamnezde ortaya çıkar, kadın hasta öncelikle, bu

soru sormaya pek az ilgi gösterip kaybın anlamını önemsizleştirir. Ağrı terapisti, bu olduğundan daha önemsiz göstermeyi, kadın hastanın kendi ağrısının duygusal tarafına henüz tam olarak yönelemediğine işaret olarak anlar. Bundan dolayı kadın hastaya önce ilaçla tedaviyi tavsiye eder, kayıp konusunun herhalde hâlâ konuşulmaya açık olduğuna işaret eder. İlaçla terapide başarılar ve hekim-hasta-ilişkisinin duygusal pekişmesi sayesinde, hekimce daima sunulan konuya yeniden başvurma, kadın hasta için daha da kolaylaşır. Böylece geçici olarak bir durum ortaya çıkar ki, bu durumda kadın hasta gerçi ağrısı indirgenmiş, ama aynı zamanda ruhsal olarak kuvvetli müdahale edilmiş ve psiko-vejetatif bir şekilde istikrarsız kılınmıştır. Hüznün baştan sona işlenmesi, başka ilaçlı tedaviyle birlikte (toplam 12 hekim muayenesinde) 5 ayda (vizüel analog skalasına göre) % 80 civarı durağan bir semptom azalmasını olanaklı kılar".

"Yaşamın asıl boyutu, ağrıda sezilebilirdir" – verilen vaka örnekleri Gadamer'in bu cümlesini açıklar, yeter ki ağrı yaşantısının varoluşsal-kişisel tarafını görünür kılsın. Ağrı yaşantısı hakkında "ağrıların yatıştırılması ve sınırlandırılmaları" hakkında ve "ne olduğumuz"a dair bir anlayış kazanabiliriz. Herhalde başka hiçbir fenomen, bizi ağrıda olduğu gibi, yaşama bizimki olarak, bizim insani-fani öznelliğimiz olarak yaklaştırmaz. Muhtemelen ıstıraplı ve ölümcül bir dermansızlık ve güçsüzlük ile yüz yüze olan kanser hastası Sigmund Freud 19 Mart 1926 yılında psikanalitik kolej Eitingon'da şunu yazar: "Uygun olmayan bir şeyin, düpedüz en muhtemel olduğu için, beklenebileceğine kimse inanmak istemez. Yanlış tasavvurlar kurmayın, umutsuz ve depres-

yonda olduğuma inanmayın. İnsan her koşulda kendi açık yargısını muhafaza ederse, bunda büyük bir başarı ve zafer görürüm". Açık yargı, bu, Freud'un son ana dek bağlı olduğu değerdir. Ağrılar ve bu ağrıların yol açtığı uykusuzluğun durumunu daha da kötüleştirdiğinden ağrı ve sakinleştirici ilaçları büyük oranda almaya dair doktorların tavsiyesine cevabı şuydu: "Açık düşünememektense, ıstırap içinde düşünmeyi tercih ederim" (krş. Lang 2000a).

Akut, organik koşullu ağrıda tabii ki, kendi algı ve uyarı işlevine dikkat etmek gerekir. Kronik ağrıda da biyolojik olarak önemli uyarı işlevi söz konusu olabilir, ancak çok önceden biyolojik olarak "boşa işleye"bilir, mesela fantom ağrıları olan ya da bir defa "organik" temellendirilmiş şikayetleri olan hasta örneklerinde bu sebep olmadığı ve buna rağmen ağrıların daimi hale gelmeleri gibi. Organik olanın yanında psiko-sosyal yönü dikkate alan bütünleştirici erişim, o zaman zaruridir. Öznel-psikolojik yönün modern tıbbımızda da ağrı yaşantısını ne kadar çok etkileyebileceği, kendi başına plazebo etkisi gösterir (krş. Lang ve Faller 1998). Ya da yaralanmaları, savaş alanından tahliye edilmeyi gerektirdiğinde çok ağır yaralanmada ağrılardan pek şikayetçi olmayan yaralı askerleri düşünelim (Beecher 1959). Alp cephesine konuşlandırılan Birinci Dünya Savaşındaki Amerikan askerleri, "million-dollar-wound"'tan söz ediyorlardı. Heidelberg'teki kanser projemizde (Seemann U. Lang 1991 1.) kendini gösterdiği gibi hastalar kendi korkularını ortaya çıkarmayıp bunun yerine ağrı yaşantısını öne çıkararak daha ters bir durum, söz konusudur, öyle ki ağrı, korku eşdeğerine dönüşür.

Gadamer'in talep ettiği bu daha kapsamlı yaklaşımda,

keza insani ağrı yaşantısının sosyal veya kültürel boyutunun birlikte hesaba katılması gerekecektir. Burada tek bireyin ağrı yaşantısını birlikte biçimlendirip ağrının benimsenmesine katkıda bulunacak yorumlama ve anlamlandırma şemaları mevcuttur. Ceza, günah, sınav vb. olarak ağrı, Garp kültürünün yaygın yorumlama modelleriydi (krş. Lang ve Faller 1998). Gadamer'in "ağrı savunması", yanıltabilir, Stoaları hatırlatabilir, ama, bunun "Apatheia" [duyumsamazlık] ve "Ataraxia" [dinginlik] gibi kavramlara nasıl yakın durduğuna içten dokunmama onun için söz konusu değilmiş gibidir. Daha ziyade burada herhalde Heidelberg Üniversitesi Felsefe Bölümü kürsüsündeki selefiyle aynı düşünüyordu. "Philosophie" adlı eserinin "Existenzerhellung" üstbaşlıklı ikinci cildinde Karl Jaspers önce, insanın acı karşısında iki olanaklı tavrını tasvir eder: Bir yandan modern tıp anlamında acıyla mücadele edilebilir ve diğer yandan acıya yol verilip, mesela inkar edilebilir. Böylece Heidelberg'teki eski bölümümün daha önce adlandırılan kanser ağrısı projesinde şu göründü ki hastalar, algılanan ağrıları, kanser hastalığından başka bir sebebe yükledikleri ve bundan dolayı, "tehlikesiz sebep attribüsyonu"nun bu olanağını koruyup sürdürmek için doktor karşısında kendi ağrıları hakkında susmayı tercih ederler.

Bu iki tavırdan üçüncü olanak olarak, "varoluşu acıyla uyandırma" temelden ayırt edilebilir: "İlkin sınır durumunda acı, kaçınılamaz bir şekilde varolabilir. Şimdi, acımı, bana olan parça olarak kapıyorum, şikayet ederim, hakikaten ve samimiyetle acı çekerim, kendimden saklamam, evet-demek-isteme ve hiç nihai evet-diyememenin geriliminde

yaşarım, acıya karşı, sınırlandırmaya, ertelemeye çalışırım, fakat bana yabancı bir şey olarak ancak bana mahsus olarak acıya sahibim ve ne edilgen katlanmada harmoninin huzurunu kazanırım ne de karanlık anlamamada öfkeye kapılırım. Herkes, kendisine denk geleni, çekmek ve gerçekleştirmek zorundadır. Bu denk geleni hiç kimse kendisinden eksiltemez" (Jaspers 1973).

Acı, ve bağlamımızda ağrı, bir sınır duruma sürükler ki bu sınır durumda, insan hayatıyla varoluşsal olarak sonlu ve yaralanabilir bir biçimde karşılaşılır. Bundan dolayı ağrıdan acı çekmeyi kendi hususi hayat icrasına anlaşılabilir bir şekilde yerleştirmek gerekir ve böylece, varoluşu aydınlatarak yaşam durumuna, yaşamın üstesinden gelmeye bizzat katkı sunulabilir.

Hermann Lang

Kaynakça

Ahrens, S., Egle U. T. (1993): *Der chronische Kopfschmerz*. Hoffmann, S. O., Egle, U. T. (Hazl.): *Der Schmerzkranke* içinde. Stuttgart: Schattauer.

Beecher, H. K. (1995): *Measurement of subjective responses. Quantative effects of drugs.* New York: Oxford University Press.

Freud, S., Breuer, J. (1985): *Studien über Hysterie*. Frankfurt am Main 1991: Fischer.

Gadamer, H.-G.(1993): *Über die Verborgenheit der Gesundheit*. Frankfurt am Main: Suhrkamp.

Lang, H. (2000a): *Strukturale Psychoanalyse*. Hans-Georg Gadamer'in önsözüyle. Frankfurt am Main: Suhrkamp.

Lang, H. (2000b): *Das Gespräch als Therapie*. Frankfurt am Main: Suhrkamp.

Jaspers, K. (1932): *Philosophie II – Existenzerhellung.* Berlin, Heidelberg, New York [4]1973: Springer.

Lang, H., Faller H. (1998): *Medizinische Psychologie und Soziologie*. Berlin, Heidelberg, New York: Springer.

Niemann, U. (1993): *Ethische und theologische Aspekte des Schmerzes*. Zenz, M., Jurna, I.: (Hazl.): *Lehrbuch der Schmerztherapie* içinde. Stuttgart: Wissenschaftliche Verlagsgesellschaft .

Sartre, J. –P. (1943): *Das Sein und das Nichts*. Hamburg 1972: Rowohlt.

Sauerbruch, F., Wenke, H. (1936): *Wesen und Bedeutung des Schmerzes*. Berlin: Springer.

Seemann, H., Lang, H. (1991a): *Coping with Cancer pain*. Senn, H.-K., Glaus A. (Hazl.) *Supportive Care in Cancer Patients*

II içinde. Berlin Heidelberg New York: Springer.

Seemann, H., Lang, H. (1991): *Tumorschmerzen aus psychologischer Sicht: Probleme und Bewältigung*. Schwarz, R., Zettl, S. (Hazl.): *Psychosoziale Krebsnachsorge in Deutschland. Psychosoziale Onkologie*, Bd. 1 içinde. Heidelberg: Verlag für Medizin.

UNIVERSITÄT HEIDELBERG
PHILOSOPHISCHES SEMINAR
Prof.Dr.Hans-Georg Gadamer

69117 HEIDELBERG, Schulgasse 6
Tel.: (0 62 21) 54 22 84; Fax: 54 22 78

22. Januar 2001

Sehr geehrter Herr Kollege Schiltenwolf,

inzwischen habe ich das Material meines kleinen Vortrags noch einmal überprüft und von Unnötigem gereinigt. Ich hätte jetzt ~~aber~~ gegen eine Drucklegung keine Einwände mehr. Allerdings fand ich manche Antworten, die ich in dem Gespräch gegeben hatte, ~~fast~~ besser als der jetzige Text ist. Wenn Ihnen das einleuchtet, könnten Sie ja das eine oder andere, was Ihnen als Formulierung wichtig scheint, etwa als Anmerkung und Bezugnahme auf die Diskussion, der Drucklegung hinzufügen. Ich spüre doch sehr, wie meine eigene Konzentrationskraft unter der Besiegung der Schmerzen leidet, die ich in ganz erträglicher Form, vor allem im Hüftgelenk, habe. Ich habe aber eine größere Vertiefung in die Fragestellung etwa zu dem Thema des Mißbrauchs von Drogen und auch der Irreführung durch die Reklame, nicht mehr fertiggemacht. Vielleicht begnügen Sie sich so, nachdem die erste Seite inzwischen triviale Mißverständnisse verhindern soll.

Da ich inzwischen stolzer von meinen Schmerzen befreiter wurde, habe ich meinen Text jetzt nochmal durchsehen. Ob Sie mich [illegible] Sie mögen Ihnen eigene [illegible] wählen. Wenn Ihnen Zitate am meinem Texte einleuchtet?

Ihr HGGadamer



ÊŞ

Hermeneutîka felsefî ya Hans-Georg Gadamerê ku di destpêka sedsala bîstan de çêbûye û ew seranser jiye, helbet ne bendkirî ye bi metnan û jiyana akademik ve, lê felsefa fêmkirinê ji ber karakterê xwe yî ji ser disîplînan re, bi jiyanê bi xwe re têkildar e.

Yek ji
xalên vê nîvenda tekildarbûnê
ye tenduristî û jiyana bi êş wek der-
vekişandina tenduristiyê. Konferansa li ser "Êşan",
ku hatiye lidarxistin roja 11ê Mijdara 2000an ji aliye
Klînika Ortopedî ya Fakûlta Tibbê ya Zanîngeha Heidelberg,
goşeyên cuda yên dîtinan anîn ba hev. Provokasyona li
konferansê, êş weke sparteka daîmî tayîn dikir. Hevpeyvîna Gadamer

NIRXANDINÊN TIBBÎ, FELSEFÎ Û TERAPÔTÎK
LI SER DIYARDEYEKÊ BINGEHÎN
HANS-GEORG GADAMER

wek axaftina wî ya serbest û zindî di vê metnê konferansê de rast tê li
ramanên bi lênêzbûniyek ji goşeya tıbbî û terapôtîk ber bi diyardeya
"Êş"ê ve, ku jiyana janbar eve di benda navdisîplîniyê de ne tenê digihe
şîroveyên cuda, lê herweha tê zimanên dinyayên-pevrejînê, mîna
wan her du zimanên dûr ji girêka mervatiyê, tê cîran ku vedikişin
ji zihniyeta mînander û neha jevcihê didine herikandin êşên
bedenî yên jiyanê ji jana jînlaşê heyatê re.

Hans-Georg Gadamer

20543
AOC

μεταβολή avesta

ÊŞ

HANS-GEORG GADAMER

avesta | METABOLE: 436 | 87
Hans-Georg Gadamer
Schmerz. Einschätzungen aus medizinischer, philosophischer und therapeutischer Sicht
Êş. Nirxandinên Tibbî, Felsefî û Terapôtîk Li Ser Diyardeyeke Bingehîn
Hans-Georg Gadamer
Wergera ji almanî: Kamile Kaş Keskin - Mesut Keskin

Edîtor: Abdullah Keskin
Berg: Azad Aktürk
Tashîh û Mîzanpaj: Avesta
Çapa Yekem: 2013, Stembol

Çap: Berdan Matbaası
Sadık Daşdöğen Davutpasa Cad.
Güven San. Sit. C Blok, No: 239
TOPKAPI / İSTANBUL
Tel: (0212) 613 12 11

Universitätsverlag Winter GmbH Heidelberg 2010²
© Weşanxaneya Avesta, Stembol & Universitätsverlag Winter GmbH, Heidelberg 2011

Sertifika no: 13193

AVESTA BASIN YAYIN
REKLAM TANITIM MÜZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ.
Şehit Muhtar Mahallesi Atıf Yılmaz Caddesi Öğüt Sokak No: 7
BEYOĞLU / İSTANBUL
Tel- Fax: (0212) 251 44 80 - (0212) 243 89 75

Ekinciler Caddesi, Nurlan Apt. Giriş Katı No: 2
OFİS / DİYARBAKIR
Tel- Faks: (0412) 223 58 99

www.avestakitap.com
http://www.facebook.com/wesanenavesta
https://twitter.com/avestayayin
avestayayinlari@yahoo.com

ISBN: 978-605-5279-39-4

ÊŞ

NIRXANDINÊN TIBBÎ, FELSEFÎ Û TERAPÔTÎK LI SER DIYARDEYEKE BINGEHÎN

HANS-GEORG GADAMER

Wergera ji almanî: Kamile Kaş Keskin - Mesut Keskin

avesta | METABOLE

HANS-GEORG GADAMER - (1900 Marburg - 2002 Heidelberg): Li bajarê Breslau mezin bûye, bavê wî yê ku wek pêşengek di nav xwezazanyarên alman de tê dîtin, li wir di beşa kîmyayê de ders didan. Li dijberî karûbarên bavê xwe, wî bala xwe da zanistiyên çandê. Lîse di sala 1918an de qedand; pêşî li Breslau, piştre li Mûnîh û Marburgê perwerda zimanê almanî, dîrok, fîlolojî, dîroka hûner û felsefê wergirt, ku bo veqezenckirin û veguhastina tecrûbeyên ramanên yewnanî yê antîk, bi taybetî hînbûna fîlolojiya klasîk di bin çavnêriya Paul Friedländer, bingeh bû. Di sala 1922an de doktora felsefê da bi teze xwe yî şewirmendê wê Paul Natorp ku pêşengê ekola neo-Kantgir e. Bêhtir ji vê meyla neo-Kantgir, rênîşander bû ew rasthatina wî li hermeneutîka liwirbûniyê (Hermeneutik des Daseins) ya Martin Heideggerê ku piştî salekê hatê bajêr ders bide. Wisa li ba Heidegger, wî tezê xwe yî habîlîtasyonê di sala 1929an de nivîsand. Gadamer heşt salan wek doçend kar kir û di sala 1937an de bû profesor. Gadamerê ku di navbera 1937 û 1947an de di beşa Felsefê de li Zanîngeha Leipzigê ordînaryûs profesor bû, ji 1947an heya 1949an li Zanîngeha Frankfurtê û wek peyrewê Karl Jaspers ji 1949an heya teqawîtiya wî ya sala 1968an li Zanîngeha Heidelbergê ders dan. Ji 1985an pê de, tevberhemên wî yên dor 10 cîldan ji aliyê weşanxana M. Siebeck (Tûbingen) ve hatin çapkirin. Ew, bi berhemên xwe layiqî gellek xelatan bû.

KAMİLE KAŞ KESKİN: Sala 1977an li Hezexê çêbûye. Mêzûna Lîsa Nisêbînê (1996) û Fakûlta Tibbê ya Zanîngeha Dicle ya Diyarbekrê ye. Karê xwe sê salan li gellek ciyan wek pratîsyen kir. Di navbera salên 2004 û 2008an de, îhtîsasa xwe di klînîka Anestezî û Reanîmasyona li Nexweşxana Perwerde û Lekolînê ya Taksim Stenbolê de qedand. Di 2008an de li Nexweşxana Perwerde û Lekolînê ya Diyarbekrê, dest bi doktorî û karzaniya xwe yî anestezî kir. Sala 2011an, di şaxê serekeyî zanistî yê Anestezî û Reanimasyona li Fakûlta Tibbê ya Zanîngeha Akdeniz de beşdarî perwerda anesteziya transplantasyonê bû. Di sala 2012an de jî, perwerdeyek bi burs û bi mijara nôroanestezî, dêhndanegeh, anesteziya transplantasyonê li Klinikum Nordstadt (KRH) û Medizinische Hochschule (MHH) ya Hannoverê wergirt. Karê xwe hîn wek doktor û karzana anesteziyê li Nexweşxana Perwerde û Lêkolînê ya Diyarbekrê berdewam dike.

MESUT KESKİN: Sala 1979an li Nisêbînê çêbûye. Mêzûnê Lîsa Mêrdînê (1996) ye. Felsefe û Îslamolojî li Bursa (2001), Berlin, Freiburg i.Br. (M.A., 2008), Bochum (2008/09) û li Heidelbergê (Dr., 2012) xwend. Berê lêkolînen xwe yî piştî doktorayê di benda ramangerînên almanî-fransî (fenomenolojî, hermeneutîk, psîkanalîz), biyoetîk, Bildwissenschaft û cultural turns de niha daye ser mijara *"Das islamische Körperbild und Leibgedächtnis zwischen Tradition und Moderne"*. Herweha ji kovarên *Philosophischer Literaturanzeiger* (V. Klostermann Verlag) û *Der Islam* (de Gruyter Verlag) re rexneyên periyodîk li ser lîteratûra felsefa îro dinivîsîne.

naverok

Li ser wergerê û ziman / Kamile Kaş Keskin - Mesut Keskin / 7

Nota Edîtorê Alman / 11

Pêşgotina Marcus Schiltenwolf / 15

Êş - Nirxandinên Fîlozofekî. Hans-Georg Gadamer / 23

Berhevdan / 33

Paşgotina Hermann Lang / 41

Çavkanî / 51



Li Ser Wergerê û Ziman

Ve-xwendina weşanger ji bo vê wergerê û li her du wateyên *wê bêjeyê* hişt em çend tiştên girîng bidin berhev, ku bi kar û nivîsa kurdî re têkildar in. Çawa ev xebata orijînal bi almanî navdisîplînî ye, wisa jî ne kar û spartekên me wergêran ku xwezayî û tibbî li vî alî, çandî û zimanî li wî alî jev veqetandî ne: Goşeyên felsefî, tibbî û terapôtik wek nîşana fragmantasyona zanistiyên serdema me, di spartekên me wergêran de jî xwe didine xuyakirin. Bêguman ne hêsan e, mirov ji almanî wek zimanek azad, qaîm û geş ê *dinyê* wergerîne bo kurmanciya ku pirraniya kurdên her çar parçeyan di hemî reng û cudayiyên xwe yî devkî de *dide axaftin*.

Astengî û *navdanîna* van astengiyan pirr in. Ger îro navê ferhenga rastnivîs û ortografya kurdî (bi ravekirina tirkî!) tevî hemî başî, zelalî û jêhatiya xwe wek mînak "Ji Bo Rastnivîsê Ferhenga Kurdî-Tirkî / Doğru Yazım için Kürtçe-Türkçe Sözlük"

berevajî kurdî xwe bi *nav* bike, îcar divê mirov zanibe,* çi *îronî* li pêşiya "*dane*yeke kurmancî ji bo rastnivîsê" ye. Bi*nav*kirin di ziman de gellek zehmet e, ji ber ku ew wek dengê gel (*voix du peuple*) û wek *yadintiy*a (*alterîte* ya) vî dengî di muqedesîtiya xwe de rû dide.

Yek ji van astengiyan, *tevlîheviy*a kurmancî ya îro ye, ku bi wergerê kêm hatiye avdan û herweha ji guhertinên biyanî û modern di danûstandin û pevreaxaftina zimanên dinyê de hinekî dûr e. Wek mînak mirov dikare binêre li dîroka *wergera kurmancî* ku axafterên wê, asîmîle bûne û jev belavbûyî di bin desthilatdariyên kolonyal ên van hema her du sedsalên dawî de dijîn. Bi hişdariyek li ser van astengiyan, me wergêran hewl da bo artîkûlasyon û xwe-derxistina kurmanciyek nûjen çend guhertinên pêwist bikin. Lewre ziman, awayê hebûnê (*die Weise, zu sein*) ye, ango awayê jiyana (*façon de la vie*) gel e, *wisa ku dervehebûniya kurdî divê bi peyv, hevok, qalib û şêweyên "biyanî" geş be*, ger jînlaşê biyanî û xweser ê wergêr di navbera *Vir û Wir a çandan* de bê hîskirin.

Ferqa mezin di navbera tirkî û kurdî de naye dîtin û ev, bo wergera ji zimanên cîhanê astengek mezin e. Danerên ferheng û rêzimana kurdî hîn nehatine wê merhalê ku li wir, xebatên li ser ferheng û rêzimanan bi jêgirt û mînakên wêja klasîk û modern tên bingehkirin. Herweha ji pirraniya lekolînerên kurd naye, kurdî bidin ber zimanên sereke yên ewropî, tevî ku kurd wek gelek li cîhanê belavbûyî bo danûstandinên bi zimanên bi-

---

* Ne ~~bi~~*zanibe*! Qertafa subjonktîf "bi" divê li vir neyê dubare kirin, mîna "bêje" (gotin) û "be" (bûn) bê "bi" (~~bibêje~~, ~~bibe~~), ku her du "bi" pev re dihelin. Lewre bi rawa kurmancî, ez dixwazim wisa **bim**, baş kari**bim**, ziman zani**bim**. Bnr. lêkera latînî pos**sum** (karîn) ji potis (kar) + sum (în, ez ...im) mîna to *be* able (to), (karîn: ability) di ingilîzî de, herweha dîsa *potest ut* (*dibe ku*) di latînî de, ango bnr. pou**voir** û sa**voir** di fransî de. Bi lêker û têgîna *Bûn*'ê, kurmancî xwedî ontolojiyek balkêş ê ku, li vir ne mijara me ye. (-j.w.).

yanî re xwedî derfetek mezin in. Ev her du çavkanî şêwe dikin pîvanek bo xebata *li* (ser) kurdî ku di wergera jidandî û pak de vedije.

Li aliyê din, nivîs û xebata felsefê wek "*kar*têgînîtî vs. têgîn-*karî*" nikare *bê zimanek jidandî, asê û rûnîştî* xwe derbixe derve. Pîvana der-vehebûna kurmancî, ne tenê wêja klasîk a kurdî ye, ku tê de "tenê helbest" bi *nebûna nesrê* hûkim dike, lê ew her sê zimanên nûjen û xurt ên dinyê ku di wan de, bi giştiya awayên hebûnê hema her tiştê beşerî ciyê xwe girtiye û jidandî ne. Di qada navdayîn û navnasiya kurdî de, rê ji zimanzanan derbas nabe; "piyase", bi bazara hespên zimannas û nivîs-*kar*an tijî ye. Ger em kurt bêjin, rêziman û ferhengên kurdî divê mînakên ji wêja klasîk bidin ber zimanên ewropî û farisî. Herweha çavkaniyên me îcar, li wê benda wêja klasîk a kurmancî û tekstûra modern a ewropî vedigerin.

Em dixwazin dêhna li gel weşanger, nivîskar û xwendevanan bidin van çend xalan:

1. Têgînên mîna "derhiş" (ji "bilinçdışı") ku di bin bandora tirkî de hatine çêkirin, (biborînin!) ne hatine bikaranîn. Ji dêvla vanan, me *hewl da,* kok û rayên van têgînan -çi rojavayî û çi rojhilatî- bi *arkeolojî û jenaolojiyek orîjînal* vekolin. Hin mînak ji bo karzanên zimanên ewropî, ev in: *Nehişî*-n (unbewusst, das Unbewusste, Tr.: bilinçdışı), *fêlrastî* (Wirklichkeit, ji lêkera "wirken", Tr.: fiili gerçeklik), *pêşberîxiste* (Vorstellung, ji lêkera "vorstellen", Tr. tasavvur).

2. Pêşniyarên naverast wek "jêderanîn" (Eindruck: İzlenim), "jêderxistin" (Wahrnehmung: Algı) û hwd. ji tekstûra kurmancî ya nûjen hatin wergirtin. Pîvana me yî ji bo *peyvên nû* mîna "xwejêr" ("Subjekt" ji lêkera latînî "subiecere") û "jînlaş" ("Leib" ji bêja almaniya kevnare "lîp", "leiben" û germen-ingilîzî "life"), "der-vehebûn" (ji lêkera latînî "exstare"), etîmolojî û termînolojiya zimanên ewropî bû.

3. Bi taybetî em li ser *girêdana di navbera peyv û daçekê de* (wek mînak a hevokê û sernivîsan) rawestiyan, ji ber ku "Kurd li Tirkiyê" (Türkiye'de Kürtler ≠ Li Tirkiyê kurd) îro mixabin ne di *rûdêna* "Kurd li Kurdistanê" (Kürdistan'da Kürtler ≠ Li Kurdistanê kurd) de xwe *serbest* dide xuyakirin.

4. Di dawiya dawî de *derdê hevoka me* û *hevoka derdê me* jî, marja vê parantêz û modelê ye: [Li dijî sistbûna berdewam û ji bo jidandinek nû ya kurmancî wek zimanek wergerê, **divê** destûr "carnan" **bê danîn**, pêveber tevî hemî *gerguhêza* xwe **bi pêş ve biçe**, **da ku** mirov **karibe** xwe **vede** ji tevlîheviyên ser- û berhevok**ên ku** ji siwarkirina gihanekan ("*ku, dema ku, berî ku, piştî ku, wisa ku, -a, -ya, -ên, yên ku, bê, bêyî ku, kî ku, çi ku; ger, her çend, çiqas-ewqas*"), ango ji pirshevokên "*çiqas, kengî, çi, kî, li kû*" **pêk tên**, *erê carnan*, **ji bo ku** çend gihanek û pêveber **tevlîhev nebin**, an jî **lev siwar nebin**, **mîna** ev hevok li jor bi *derdekî* **dest pê kir** û niha di vî rûpelî de, di vê bend û paragraf, ser- û berhevokê de bi *ewqas gihanek* û *pêveberên jêrxîşkkirî* û bi sêxaleka dawîn **diqede**...]

Yek ji *ve-kirin*ên kurmancî ku ji tecrûbeyên me wergêran pêk te, bi *rêvekirin*ên din ên weşangeriya kurdî ve girêdayî ye, ku ne li vî aliyê şopa nifşên *bindest*, lê li wî aliyê şûn û warê kurdên xwedîdaneyên biyanîtiya *serdest* divê xwe pêş xistibe. Ji weşanger re, em bo vê rê(-ve-)kirinê spas dikin, ku ne tenê *rê vedike* û *bi rê dike*, lê, ne wisa hêsan dide ser milan, bar û rîskên zanîneke ziman û wergerê ku ji têkildar û xwendevanan *fermo bi êş* qebû dixwaze.

K. K. û M. K.
Diyarbekir, Gulan 2013

Nota Edîtorê Alman

Derketina dawî li pêş gel a fîlozofê mezin î heidelbergî, konferansa li ser mijara "Êşan" bû, ku Hans-Georg Gadamerê 100 salî daye û bi mûnesabeta sempozyuma roja 11ê Mijdara 2000an ji aliye klînîka ortopedîk a zanîngeha Heidelberg hatiye lidarxistin. Di vê konferansa xwe de Gadamer provokasyonek mezin ji bo hevkarên ji tibbê formûle kir, bi saya ku wî êş wek *sparteka* daîmî teswîr dikir, ku ji şaîbeyek an jî deformasyoneke ferdê jandar pirr dûr e, bêhtir bi binyateyî, nêzîk dibe ber bi tişta ku Gadamer her dem mijûl kiriye, ber bi hermeneutîkê ve. Kiryara fêmkirinê şêwe da hevpeyvîna piştî konferansa di navbera Gadamer û guhdarên karzan de, ku di vê hevpeyvînê de her du alî bi erênayî nêzî hev bûn. Ev pirtûka piçûk di destê we de ji du aliyan ve berpirsiyar e: Ev pirtûk, axaftina Gadamer a zindî heya jê tê neveşartî

vedide û wisa hewl dide jêderanîna konferansa Gadamer a pirr bi enerjî ji xwendevanan re veguhezîne û îfadeyên fîlozof têne beranberî ramanên li ser fenomena "êş"ê ji goşeyek tibbî û terapôtîk. Ji bo vê, Marcus Schiltenwolf, ku li klînîka ortopedî ya zanîngeha Heidelberg profesor e, pêşgotinek ji goşa rast tibbî nivîsand û şagirtê Gadamer, Hermann Lang jî paşgotinek ji goşa rast terapôtîk nivîsand.

Ji bo bîranîna Hans-Georg Gadamer

Pêşgotin

Qismek mezin a nexweşên ku rojane diçin doktorekî (wek mînak ê ortopedî), êşa piştê dikşênin. Êşa piştê, ji êşên zêde yên civakên modern postîndûstriyel e û li Almanya sedema herî zêde ya teqawîta zûkayî ye. Li maliyeta êşa piştê, salê heya 20 mîlyar Euro diçe ji bo êşnasî, terapî û herweha jikarketin û li pey vê, mesrefên peredayîna kesên teqawîdbûyî li Almanya.

Modelîteyên êşnasî û terapôtîk guhertinek berbiçav di salên dawî de derbas kirin, ku him beşên bingeh ên teoriya tibbê wek anatomî û psîkolojî him jî çavdêriyên ji doktorên klînîsyen û psîkologan, zanîn û fêmiya derbarê tedawiya piştqerimiyê, êşa piştê û moxikê, fitiqa piştê an jî "siyatîk" bi pêş ve xistin.

Qezenca zanînên ilmî yên tibbê dixwaze daxuyaniyên se-

rerast, ji bo zanînê belav bike, ji bo pirr nexweşan heya jê be tevlî pêşketinan bike. Ji bilî medyayên çapê, podyumên daxuyaniyên wisa berî her tiştî sempozyum û kongre ne.

Roja 11ê Mijdara 2000an, li klînîka ortopedî ya zanîngeha Heidelberg kongreyek li ser mijara "Gihîna ber bi nexweşên êşa ortopedîk ve" hat çêkirin. Berê kongreyê li doktorên klînîsyen û psîkologan bû, ku dixwestin ji bo pêşxistinên li ser bingehên terapiya êşa piştê û herweha li ser pirsgirêkên di navbera doktor û nexweş de perwerdehiyek li dar bixin. Hîn salek berê program hat plan kirin û avêtin û dîsa hat berhevdan, ji bo bi dîmenên curecure yên pirsdayinê re hişpak bin. Di dawî de, lêkolînên bingehîn guh dane gotarên li ser epîdemiyolojî, modelên kronîkbûna hucreyan û êşa kronîk a masûlkeyan, li ser bûyerên immunolojîk ên adaptasyonê li ba êşên kronîk ên siyatîk; tibba klînîk divîba li ser îmkanên tedawiyan wisa binavkirî tevayî, yanî li ser modelên tedawiya bi parên laşpêwend û psîkolojîk vekole, divîba derheqê pirsgirêkên di navbera doktor û nexweşên xwedî êşa piştê de ronî bike û girîngiya tedawiya dermanî û bi dest mudaxaleyî (yanî bi arîkariya enjektekirinê) di roniya beşzanîna rojane de rave bike.

Baş tê bîra min ku ez mijdara 1999an li ber masa xwe yî nivîsê rûniştime, di dest min de programa amade û min awirên xwe li ser biyografiya Hans-Georg Gadamer radigerandin, ku Jean Grondin nivîsandiye û ji çend mehan ve li wir e. Dema ev pirtûk di destpêka 1999an de li Heidelbergê hatibû danasîn, wisa hat diyarkirin ku Gadamer, bi rastî hebûna xwe yî li wir pejirandiye, lê niha ew ji ber sedemên tenduristiyê nikare bê; ew êşa siyatîkê dikşêne. Ez nizanim êdî bi kîjan

telkînê min girêdaniyek di navbera Hans-Georg Gadamer û kongeraya êşa piştê de çêkir, ku li ser tê karkirin; awirên min ên ku bi pirtûkê ve bûbûn, ez bernedam. Ez êmin bûm ku divê li ser pişta mirov ne tenê lêkolînên xwezazanyarî û tibbî ronî bidin; na, yekî wek Gadamer, ku pîşe û bingeha wî, fikirandin û nîqaşa bi însanbûnê re heya dawiya emrê wî bûn û hîn jî ew in, divê [çê]kirina tibbê ji pozisyonek notr şîrove bike û dê karibana wek kesek mûteessîr vêna bi mafê xwe bike.

Ji ber çi divê fîlozofek di nav gotarên ji bilî wî tenê seranser tibbî de hebe? Lêkolîna tibbî -azmûnî di laboratuara beşên teorîk ên bingehîn wek anatomî û fîzyolojî, klînîk bi saya çavdêriya nexweşan ji aliyê doktor û psîkologan ve- di salên dawî de qezenceke bê hesab li zanîna derheqê çêbûn û pejirandina êşan derxist holê. Bi saya vê, terapiya dermanî dikare bê perisandin, îmkanên tedawiya operatîf ji bo nexweşketinên kifşkirî yên êşê zêde bûn. Herweha zanînên li ser rêbazên tedawiyên neserkeftî an jî kêmserkeftî hatin qezenc kirin. Gellek tiştên ku doh hîn baş û birêkûpêk bûn, îro ne wek arîkar in û avêtî ne. Derbasa ji êşên teze ber bi yên sekinî ve, krononîkbûn, gellek caran li ser hev hatiye vekolîn, wisa ku îro dikare bi zanistî bê bingehkirin û şîrove kirin îfadeyek wek: "Esasen, ez dikarim bi êşan re baş bijîm, lê êşên ku bi wan re divê ez niha şer bikim, ji bo min pirr zêde ne -mirov nikare niha êdî tiştekî ragire!"

Dîsa jî êş têk neçûye wek nexweşî ji zû ve; tam dijberî vê ye ku hin êş tevî hemî hewldanên tibbê zêde dibin; mirov hema xwedî jêderanînek wisa ye ku hin şertên civakî, piştgiriya wê derketin û gurayiya êşan dikin; wek mînak, mekanîkbûna

bi zêdeyî ya jiyana rojane, herweha tevlîhevî, pêsta demê û xemsariya pêwistiyên laşî yên tevger û vehesînê dikarin werin binavkirin. Serbixwe ji pêşbirka di navbera şertên jiyana rojane û îmkanên tibbî de, nexweş bi pêdiwistiyên xwe yên ferdî di temasa rojana ya li gel nexweşan de ber bi navenda berjewendiyên terapôtîk ve diçe, ger qala wê bê kirin ku êşên kronîk bi saya plana serkeftî ya tedawiyê tên hedinandin.

Lewre, tevî hemî zanîn û hewldanên tibbî, wek navenda êşê kesê mûteessîr, ango newxweş dimêne. Kêm vexuyan hene ji bo mirov êmin be ku tedawiya êşê ji ser nexweş re dê karibe wek çalakiyek mekanîk li heybereke bi xesar serkeftî be. Nexweş divê wek xwejêr* bê gihîştin, lazim e fêmî ji bo terapiyê bê şiyarkirin, ferq nake ku ev, ji bo bergiriyên dermanî an jî operatîf, fizîkî an jî psîkolojîk be. Tenê fêmî

* Peyvika almanî "Subjekt", ji lêkera Latînî "subiecere" ("binavêtin") ango ji PPP ya wê "subiectum" ("binavêtî") der tê, ku bi peyvika kevnare ya yewnanî υποκείμενον (hypokeímenon: bindebûn, binyad bûn) li ba Anaksîmender, Demokrît, Platon û Arîstoteles girêdayî ye û wate dike "bingeh (kirin) palder, binyad, esas (bûn)". Ew esas e, ku jê her tiştên din tên derbirrîn û îfadekirin, lê ew bi xwe, ji tiştek din nayê derbirrîn û îfadekirin, herweha ji determînasyonan û çawaniyan azad e. Ev bêçawanî wê dike barkêşa hemî çawaniyên cihê. Gava ku *hypokeímenon* ango *hîpokeymenon* wek *subiectum* ji aliyê Boethius di heyama navîn a felsefa Rojava hatiye wergerandin û wek tişta daîm heye (û bûye) wate kiriye, îcar di heyama modern de, Descartes pêwendiya vê tegînê bi *Ez* re daniye ku esas û binyadê her tiştî ye. Ji wê wata felsefa modern mirov dikare ji bo kurdî vê têgînê wek *Xwejêr* wergerêne, ji ber ku *Ez* ê modern bindavêje, bindixe, *xwe* kiriye bingehê her tiştî û her tişt *jêrê* wî ye û her heyber ji bo hukm, îktîdar û desthilatdariya wî heye. Ew, jêrê jêran e. Rexna li xwejêrê modern, yek ji mijarên girîng ên sedsala bîstan e. Bêjeyên wek "babet, kirde, kirdar, pîşkar, rajêrek û hwd", ne hêmanên vê benda felsefî ne, lê wek mînak di fîlolôjî û rêzimaniyê de cî digrin. Pêdanîna "heyber" ku jêderek ji berhemên Celadet Bedirxan û Salah Sadallah e, ji bo têgînzaniya felsefê gellek rast û di cî de ye, ji ber ku têgîna obje (Objekt, object, objet) ji lêkera latînî "obiecere" ("beranber avêtin"), "obiectum" (beranber avêtî) der tê û ev jî heyber e, ango, heye li ber xwejêr (*-j.w.*).

dê karibe nexweş bike hevlîstikvan di terapiya êşên xwe de. Û ev pevrelîstin, bingeha girîng e, ji bo pêvajoyên tedawiyê karibin dest pê bikin.

Min rêbera telefonê vekir, geriyam û hatim girêdan. Heya hingî temasek şexsê min bi Hans-Georg Gadamer re qet çênebûbû, lê bê plan û xîret hevpeyvînek hema dor saetekê li ser êş, terapiya êşê, zanîn û mîtan, wateyî û newateyî derket holê. Li gor wî wek mînak derxistina gotegotan newateyî bû, ji "siyatîk"ê dema danasîna biyografiya xwe nikarîbûya amade be- na, pirtûk ne ya wî bû, dê îcar çi kiribana li wir. Gadamer li ser felca zarokan, başbûna xwe axivî û ew êdî di temenê xwe yî bilind de dibîne, ku wî ev nexweşiya giran sax derbas kiriye. Erê, dê mijar wî pêwendîdar bike, lê naxwaze bêje erê; di dawî de tirs dike, ku newêre bi pîrozbahiyên bê dawî ji bo 100 saliya wî di 2000an de mijûl be.

Bi erêniyek xumam, programa kongreyê hat çapkirin. Min daxwaza Gadamer pejinand, ku ew him dixwaze gotara xwe bide û red neke, him jî sînorên qeweta xwe qebûl dike beranberî bargiraniyên ku rojbûna wî ya sedsalî bi wî didin. Lê belê: Pênc deqe berî destpêka civîna piştî nîvro, Gadamer li ciyê xwe, li salona klînîka ortopedîk a zanîngehê ya qada Heidelberg-Schlierbach rûnişt û berî her tişti axaftinên li pêş xwe guhdarî kirin.

Lêkolînerên xwezanas, hekîmî û psîkolojîk, di gotarên xwe de li ser vê yekê li hev hatibûn: Êş divê kronîk nebe, ji ber ku laş bi saya êşê hestiyar dibe û pêvajoyên lêanînê çê dibin, ku newxeşên êşê diguherînin. Her tiştê ku hunerê şifayê pêşkêş dike, divê bê hewldan li dijî pêvajoyên kronîfîkasyona çêbûniya laşî û psîşîk bi bandor bike, ji ber ku şifayek ji xwe bi xwe nîne.

Gadamer pêşî kêmdeng axivî, piştre her tim bi hêztir û ji destpêkê ve bi biryar. Na, êş li gor wî ne pirseke derheqê tibba herî baş e, lê pirsek ber bi kesê mûteessîr bi xwe ye. Gadamer paradîgmayek girîng formûle kir, bi saya ku wî êş wek spartek rave kir. Gadamer provokasyoneke pirr mezin li hawireke kesên ji terapiyê qanehbûyî anî ziman, ku etîka hekîmtiya wan bi rastî ji peş ve dinivîse, "her tişt, tenê ne zerar", lê dîsa jî libarkirina şifayê û arîkariyê hîs dikin û dijîn. Na, ne tibb ferbûn, lê fêrbûna halkirina spartekê di êşê de. Protagonîstê şifayê, kesê mûteessîr bi xwe ye.

Êdî Gadamer vekirî hişt çiqas doktor û çiqas tibb dikare hebe li ciyê ku xeta veqetandinê divê di navbera hîn girîng û ji zû ve pir zêde de bê kişandin, lê ev, ne wezîfa wî wek fîlozofekî di nav zanyarên xwezayê, doktor û psîkologan de bû. Herweha ji bo terapîst cî nîşan da û ev cî ne li ser nexweş e, lê li cem nexweş e, li wir, li ciyê ku mirov dikare serfiraz be bigihîje nexweş ji bo terapiyek bi wî re û li wir dikare mumkin be bide hember tişta pêvajoyî ya kronîkbûna êşan bi saya pêvajoyên dijberî hev ên fêrbûnên nû.

Îcar nexweş nikare bi saya tibbê bê înstrûmentalize/navgînîkirin, lê ew dadigere ber bi xwejêrê geşedanekê û wisa dimêne, geşedaneke mûteessîriya xwe. Ji bo fêmiya vê geşedanê nexweş dikare arîkariya tibbî bixwaze.

Bêyî ku mirov zanibe, belkî zanyarê çandê zanînên tibbî û psîkolojîk rave kirine, ku tenê nexweşê bi fêm ji terapiyê re motîve ye û amade ye ji bo bandora û dijbandora dermanan jî qebûl bike û karibe sebir bike û bi semax be: Ev nexweş, terapî ber bi terapiya Xwe-tayînkirî û Xwe-berpirskirî rave kiriye, ji ber ku ew di terapiyê de ne hatiye tengkirin. Wisa

bi îmkan dibe ji wî re bigihîje sparteka xwe yî xweser jî di tedawiya êşan da. Di dawiya dawî de çareseriya vê spartekê dikare bigihîje jêxelasbûn û derbasbûna pêwistiya terapiyê.

Gadamer karîbû ji tecrûba bi êş a jiyana xwe ragihêne û herweha ne qala nêrînên razber ên ramanwerekî dihatin kirin. Wisa ji bo wî ne dijwar bû, ku piştî axaftina xwe wî bersiva pirr pirsên karzanên terapiya êşê da. Fîlozof gotarek tibbiyî din dernexist pêş, lê da dîtin, çawa nexweş, doktor û tibb, bi hevdû re tekildar in û têkiliyê qebûl dikin, ji ber ku wî wisa karîbû vêna ji dîtin û tecrûba xwe ya xweser binirxêne.

Wek doktor ez nikarim tengezar bim û bawer nakim ku Gadamer mafê terapiyê radike, lê ew, cî ji terapîst re dest nîşan dike -him li aliyê daner, doktoran, terapîstan, him jî li aliyê standeran, nexweşan- ku li wî ciyî ne tenê ji doktor re tê îtîraf kirin, lê jê tê xwestin xwe bi sînor bike. Herweha li wî ciyê ku sparteka nexweş dest pê dike.

Bi taybetî ez kêfxweş kirim, dema Gadamer di demek şûn de kirin û çapkirina axaftina xwe pejirand. Metnê amadekirî êdî negihişt wî.

Spasiya xwe dixwazim bikim li cem Universitätsverlag Winter û weşanger Dr. Andreas Barth, ku ji aliyê xwe wezîfe da ser milan, ji axaftinê nivîsekê çêbike; berî vêna Ingeborg Weymann xanim hiştibû qismên pirtûkê di metnê nivîskî de derbikevin holê.

Marcus Schîltenwolf
Heidelberg Gulan 2002


PT 100

Hans-Georg Gadamer

Êş - Nirxandinên Fîlozofekî

Min axaftin, bi pûteyek mezin guhdarî kirin. Helbet min tam nizanîbû, di kîjan rolê de ez li vir im. Ger divê ez li ser jiyana xwe yî bi êş vebêjim, ku min wisa wêrek bi dirêjayî kişandiye, an jî, ji min bê hêvîkirin ku lazim e bi çend gotinên bingehîn li ser vê yekê biaxivim, ka êş çi didin wek spartek ji bo fêrbûnê di heyama teknîkê de, ku tê de em dijîn.

Êdî ez dest bi tişta bingehîn bikim, bi wê ku min -bi razîbûnek mezin- di axaftinên berî min de têderxist û pêwendiya wê bi vêna re heye, ku serbest tê axaftin. Bi giştî ez ne zêde arîgirê vê tişta hanê me ku mirov her tiştî amade dike û li pêşiya herkesî dixwêne. Yek ji atavîzmên herî xemgîn ên jiyana akademîk, di çavên min de, ji vê xwendina li pêşiya herkesî

pêk te. Lê bi taybetî ji vê, mirov nikare bawer bike. Bi rastî nîne tiştek wisa! Xwendinek li pêşiya herkesî! Bi xwendinek wisa li pêşiya herkesî, mirov dikarê bigihe ku Yêdin, bi fêlrastî fêm dike? Helbet ez bi xwe re her car wisa kaxezek piçûk tênim, wek tê zanîn, ev parçeyekî wê ye ku ev kaxeza amadekirî bi awayekî tesîr dike; lê bi rastî hewl didim hevpeyvînekê bikim bi guhdarên ku li gel wan ez diaxivim re; hevpeyvînek ku tu car pêk nayê ji vêna ku kesek ji naverastê ve ber bi Yêdin re diaxive. Piştre, piştî dawiya gotara min a piçûk, helbet berhevdanek fêlrast hebû, ku dê ji ser sînorên asoya xwe ve hîn bike. Ji ber vê, her hevpeyvîn wisa hêja ye, lewre hevpeyvîn di nava me de, zanîna li dor sînorên xwe yî xweser hişyar dike.

Ji bo em zanibin, ka êş çi ye, belkî watedar be em bipirsin, kengî em êşan cara yekem bi hiş têderdixin. Çi ye, wek mînak, qîrîna pêşî ya zayînê? Îfadeyeke êşê ye? Mirov tiştekî wisa dizane? Mirov dikare tiştekî wisa zanibe? Ez nizanim? Rastandî, ev bertekeke eslî ye, ger em wisa karibin bêjin, ne bê enerjî hiştî li guherîna nebawer û bê pêşberîte ya dinyayê ye, ku qîrîna pêşî ya zayînê derdixe hole; nîşaneyek e ku jiyan dest bi vê qîrînê dike, bi vê teqîna enerjiyê ku tê de bi taybetî biyanîbûnên wek êşê jî rolekî dilîzin. Hîn li vir, ez hîs dikim, ka çawa di qîrîna zayînê de, nîşana pêşî ya derbarê hevpeyvînê bi vî Yêdin re, ku hîn nehatiye dîtin, bi dêka xwe re an jî bi doktor re heye. Hîn di vê rewşa pêştirîn de em li pirsên balkêş rast tên.

Bêguman mirov kêm dikare rola tibba îro baştir nas bike, ji demeke ku mirov li tibbê binêre wek qada kar û xebatê ku di têkoşîna li dijî êşan de diqede, lê mirov dikarê hêsan ji bîr

bike di derheqê vê mesela hanê de ku rizgarbûna ji êşên giran, ji roja roj ve parçeyek tecrûbeyên jiyana însan e: Wek tê zanîn, em hemî xîret û wezîfeyên taybetî di berteka rasterast a xwezayê de nas dikin, ku em wek êş bi tecrûbe dijîn. Diyar e, parçeyek denga jiyana mirov, ew derbaskirina rewşên bi êş û hedandina wan e, bêyî ku pê re arîkariya tibbî divê bi giştî bê destpêkirin. Wek mînak mirov bêne bîra xwe qerimîna masûlkê ku nexweşiyek e, wek tê zanîn, lê encameke tebîî ya westandinê ye. Mirov dikare bêguman qebûl bike ku ji roja roj ve armancek reftara beşerî, rawestandin û sivikkirina êşê ye. Wisa hema tebîî bû, ku pîrik û dayîkan hewl didan êşa zarokan sivik bikin û bi rastî nifşa ji zû ve serbixwe û gihayî ji bîr nekirine.

Lê wisa bi heman awayî, ji xwe re tê fêmkirin, ku ev teknîkên ji nifşan ve heya îro mane -îmkanên tedawiyên êşanguhertinek girîng tecrûbe kirine. Doktorê ku tedawî dike, kronîstê van guhertinan e. Nexweş -texrîqbûyî bi navgînên girseyî- têkoşîna kîmyayî li dijî êşan dixwazin, li wê derê jî ku tê de doktor divê ji vê têkoşînê ji ber sedemên baş vebide û bi vî awayî prestîja xwe rîske dike. Têkoşîna li dijî êşan ji ber vê yekê dadigere di heyema teknîkê de ber bi pirsgirêkek teybet a tedawiya doktoran, bi taybetî pişt re, dema ku qala tevizandina êşan tê kirin. Bêguman bi saya geşedanên teknîkê û bi taybetî yên zanistiyên kimyayî, mirov xwe dibîne, hatiye dayîn û têxistî li pêşiya derdorên pirr nû yên bandora şifayê, wisa kêm balê dide ser formên tebîî yên tedawiya êşan û li wan dinêre.

Li ba rewşa tiştan divê mirov şaş nebe di derheqê vê ewkê de ku mirov li vir pirr suiîstîmal dibîne, an jî em bi awayek

din bêjin: Mirov pirrî caran ne bi sebra pêwist li seyra tebîî ya şifayê rast te. Herweha ew ji xwe re tê fêmkirin (an jî divê herî kêm wisa be) ku li rêbazên şifayê yên heyama berê jî divê ji bilî nexweşxaneyên bi teknolojiya bilind û zanîngehen beranber bên nêrîn. Avantaja van rêbazan ji bo min rasterast û bê navgîn nêzî aqil e, ger mirov fêr be rêbazên tebîî wek piştgiriya pêvajoya şifayê têbigihîje. Tu kes dê nikaribe ciddî minaqeşe bike fêda dermanên ji aliyê zanistiyan çêkirî ku êşê sivik dikin, an jî jê vedidin; pêvajoya tebîî ya şifayê bi rastî ne wisa zû arî tenduristiyê dike, lê bi wext, baş.

Ez vegerim jiyanbariya pêşî bi hiş a êşê. Mirov dê mecbûr be ji xwe bipirse, ka çawa pevfêmxistina/fêmdana jiyana gihayî hêdî bi ser dikeve. Kî kêfa pêşî ya dê û bavan li hember peyva pêşî û serkeftî ya zarokê nas nake. Çi, ku fêrbûna axaftinê wate dike ew, pîvandina wê, divê ji me re bê wezîfekirin; derbaseyek ji lîstikê ber bi serfiraziyê, bidestxistina ku eydî kesekî ye, an jî, ya ku jê re, mirov pêşî îddiayan bike. Ew, salên perwerdeyê bûn, ku wata wê, em dipêjnênin, ger em jiyana di malbatê de û cîhana aşînayî ya zarokatiyê berdin.

Helbet min bi xwe, bi bîst saliya xwe tecrûbe kir, ka êş dikarin çi bin, dema ku ez -bi felca zarokan pêve buyî- bi hefteyan û bi êşên giran ên piştê di nav cihan de bûm. Bi vê re, berî her tiştî divê ez tengezar bana, ka kulekî dê xurt bin û heya çi dereceyê dê xurt bin, her tim li zanîna min a derbarê ku mirov hîn tu tedawiyê li dijî nexweşiyan nas nake; û helbet ji van êşan, mirov qet nikare xwe vede. Wisa li ser doşekê min dîsa dest bi lêkolînên xwe yî felsefî kir û di navberê de min, tevberhemên helbestvanê bi gumana min ê herî mezin ê alman, Jean Paul xwendin. Ev tevberhem hema bêje ji 20

cildê pirtûkan pêk dihat. Di dawî de êş vegeriyan çûn û tenê ma ziraviya paqên min ku dihiştin ez bi salan spor bikim, bi taybetî li ser qadên tênîsê ku li wir tenê mesafeyên kin tên bazdan. Pêşî, di temenê min î 75an de divê min dev ji lîstika tênîsê berdabana û di salên xwe yî li Heidelbergê de min rêdaristanên li Odenwaldê tev baş zanîbûn.

Niha helbet divê ez bi kopal biçim û li ser bisiklêtekî îdmanê hînkarî bikim, ji bo ez karibim li ser lingên xwe biçim. Tevî ku felca zarokan hîn enfeksiyonan û komplîkasyonan di rewşa niha ya lêkolînên tibbê de çê dike, her tim nû di helîna masûlke ya temenê bilind de têne bi bîranîn, wisa ku çûyîn bi taybetî bê êş naqede. Lê bi tevayî divê ez bêjim, ku min encamên vê nexweşketina giran baş derbas kirin, aha wisa mîna jînbariyên din ên gurayî yên êşan. Eve, ew jînbar in ku kesekî ji bo êşê hissî dikin, berî her tiştî, ger ev êş nehêle em razin. Ew pirr erjeng e, pê re binêre, ka çawa nexweş bi şevên bê xew şer dikin û -pêşî gava ku roj hildide -ji bo kêliyekê bi xew ve diçin. Evana tecrûbe ne ku mirov wek ixtiyarek hema hîn bûye bi jixwerefêmkirinên mezin qebûl bike. Şertê vê, helbet razanek xweş û vehesîner e.

Ew tê zanîn bi giştî, ku di vê navberê de pêşketinên di terapiya kimyayî de, çiqas mezin in. Di derbarê van de divê neyê jibîrkirin, ku bikaranîna bê bijarte ya van pêşketinan bi xwe re talûkeyan jî têne. Wek tê zanîn ez bi xwe kurê lêkolînerekî kimyayê û dermansazekî me, ku di lekolînên alkaloîd de xwedî navek e.

Helbet ji bo bavê min, ew dilşikestinek mezin bû, ku ez wek xwendekar -ji dêvla li zanistiyên xwezayê xwe germ bikim- çûm ba "profesorên devbelaş"; êdî mirov karîbû vê jî

derbas bike, û bav nikarin guherînekê di dawî de lê bikin. Wek tê zanîn mirov divê ji bîr neke, ku mirov mîrasa xwe, ne tenê ji bavê xwe, herweha ji dayika xwe jî werdigre. Min dayîka xwe ji zû ve, bi çar saliya xwe winda kir û di encama vê bûyerê de min hingî bi derengî coşa wê yî kûr a hûnermendîtiyê wek girêdana olî nas kir, yanî dema xwendina berhemên ku wê li pişt xwe hiştine. Bavê min li wir pirr cihê bû ku ev rewş dikare epîzodek piçûk bi henekî wêne bike.

Bavê min, berê, 61 salî mir ku ev, kesekî şaş nake di rewşên hingî yên laboratuarên ku di wan de wî divê kar bikira (bavê min ji tumora kezebê mir). Dema ku ew di dawî de li Marburgê di klînîkê de radiziya, ji xwe re pirr fikarên mezin ji bo min dikirin. Bi rastî di salên xortaniya xwe de min doktora xwe da, lê wek tê zanîn, ev hîn, ne karek bû û hingî habîlîtasyona min nû dest pê dikir. Wisa, bavê min ji mamosteyê min ê hingî Martin Heidegger re nivîsand, ku Heidegger carekê li klînîkê serekî lêde. Helbet ev, qewimî. Heidegger hat û pirs kir: "Begê min, ez dikarim ji bo we çi bikim?", wisa kûbar çawa mirov bi ixtiyaran re diaxive. "Ax", got bavê min, "Ji xwe re ez fikaran ji bo kurê xwe çê dikim, ka divê eceb ji wî çi çêbe? Ev, bi rastî felaketek e!" Îcar Heidegger, xema wî revand û bersiv da: "Lê kurê we bijarte ye û ji zû ve di nav habîlîtasyona xwe de ye. Teza xwe ji zû ve daye, habîlîtasyon berdewam dike." Her hal di navbera her duyan de hevpeyvînek dirêj hebû, heya ku bavê min ji Heidegger ji bo xatirxwestinê pirsî: "Ez dikarim tiştekî ji we bipirsim, hevkarê min î birêz: Hûn esas bawer dikin, ku felsefe ji bo domandina jiyanê têr dike?" Mînakek tenê ji bo kirina mezin a lêkolînerekî xwezayî bi wezîfeyên wî.

Yekem piştre ez fêr bûm ji hundir ve bibînim ku çi di piştvê helwestê de heye. Dayika min, ji nexweşiya şekir mir ûçend sal piştî mirina wê wî çaxî, di lêkolîna alkaloîd de dermanek hat dîtin ku karibû vê êşê bi bandor tedawî bike. Ez wisa bawer dikim, dîtina bavê min a yekalî li ser rêjiyana min, esas deyndarê vê rewşa hanê ye ku wî êdî nikarîbû bi xwe ew pêşketinên di tibbê de li ser jina xwe bi kar bîne, çawa wî karîbû vanan ne tenê têderxîne, herweha pev re bilebitîne.

Lê ez dûr ketim hinekî ji mijarê. Ez dikim pev re lihemberbidim her du aliyên sereke ku yek jê, qîrîniya pêşî ya êşê û kulektiyê ye, û ya din, êşên 'kuskusandî' ne, lê daîmî yên gazinên ixtiyariyê. Ew pirr dijwar e, werê veguhestin di navberê de, ji ber ku em di êşê de ne û nikarin êşê ji xwe veqetênin. Êş qey dorê li jiyana me digre û ji me her dem qebû vedixwaze. Pirr e tişta ku êş dixwaze. Mutleq pêwist e ew, dev ji wêrandine ne bê qerandin, ferq nake çiqas mezin êş dikare be. Kî vê diqedêne ew dikare êşan -di almanî de, peyvek mûkemmel heye ji bo vê- 'hezm bike' ['verwinden']. Ziman wisa zana û aqilmend e, em hemî ji aqilmendî û zanîna ziman dijîn, em fîlozof bi taybetî. *Verwinden* [hezmkirin], çi peyv e lê? Û bi vê bêjeyê çi gotî ye? Ji vê bêjeyê, ger em karibin bêjin, hostabûna li ser êşan diaxive. Ew, di jiyana me yî ecêb de hema ya herî heyirî ye, ku mirov ji bîr dike, dikare ji bîr bike ku bi taybetî ya hêjatirîn hêdî hêdî winda dibe. Jibîrkirînî, zaafek e. Xuya ye li vir îmkanek heye ji bo mudaxele bê kirin li dijî êşê bi riya Xwe-parastina xweser, bi saya ku mirov xwe dide ji tişta ku kesekî temam dike. Tu tiştek din ji hestê nahêle êş herî nêzîk ragirî be; ji min re tiştek ayan dibe, tiştek tê bîra min. Wek tê zanîn her dem heye bargeheke tiştên neçêkirî û

netemamkirî, ku em hewl didin hezm bikin. Di vê watê de êş, derfetek mezin e, belkî derfeta herî mezin e dawî 'amade bûn' bi wê tişta ku ji me re spartî ye. Dîmenê eslî yê jiyanê dikare di êşê de bê pêjnandin, ger mirov nikaribe xwe *derbas bike*. Di vê rastiyê de jî talûka herî mezin ya heyama teknolojîze dibînim, ku ev hêzana wek kêm û hindik tên dîtin û bi vê yekê jî -bi awayekî fêmkirî- karînên me êdî digihîjin geşedanek tam. Li beranberî vê yekê jî kêfxweşiya serkeftinê, bidestxistinê û xwe dîsa jînde hîskirin, disekine. Ez nikarim înkar bikim, ku ev kêfxweşiya serkeftinê, çavbaliyê û xwedayînbûnê ku heye di çavbaliyê de ye, lê herhal hîn her dem, dermanê baştirîn e, ku dikare xwezayê bide destê me.

Di jiyana xwe yî xweser de min berî her tiştî ceriband hêzên organîzma xwe xurttir bikim. Herweha ez xwedî derfet bûm di wextê rast de doktorek baş bibînim ku ji bilî vê hevalek baş jî bû. Ez li ser Paul Vogler diaxivim, ku li Berlinê xwedî profesortiya sêyem a Charité ya tedawiya tebîî bû. Ew di demjiyana xwe de hîn fîgurê awarte yî nadîr bû. Îro -vêce di demên ku di wan de mirov bi giştî ji talûkeyên tedawiya tenê kimyayî ya nexweşiyan hişdar in, dê ew di civaka baştirîn de be, ger hûn bixwazin li min çend gotinên pesnî bibexşînin. Vogler bi saya rewşên pirr kifşkirî, hatibû ser riya xwe. Di destpêkê de wî birêveberiya nexweşxaneyeka karkeran li Märkisch Lausitzê wergirt, lê hemen ji rewşa pereyî ya peydakirinê ne razî bû, wisa ku ew di dawî de li Frankfurta li ber keviya Oder bi cî bû û li wir rêbazên tedawiya tebîî li kevneşopiya kevnare ya malbatî bi serkeftinek mezin pêk anîn. Hewesdar bi vê serkeftinê, wî lêkolînên xwe li ser vê beşê bêkemasî kirin; ji bo arîkariyên wî yên pirr jêderanî, ez bi xwe spasdariya wî di-

kim. Wisa di vê encamê de, bawer dikim ku ez ji bo vê benda li vir teswîrkirî bi taybetî di vê beşa tibbê de jî ne bitemamî biyanî me, ger ez vî aliyî wisa xurt bikirpînim. Di rastiyê de, têgîna felsefa hermeneutîk jî, ku bi saya karên min bûye moda, vê nîşan dike: Bêja "hermeneutîk", ji navê "Hermes", peyikê yezdanan, tê. Peyikê yezdanan çi ye eceb? Lê heye peyama peyikê yezdanan ku Zeus spartiye ji wî re bixwîne? Ez ji vê, bawer nakim. Zeus tu car peyamek ne daye Hermes. Lê belê Hermes di nav welat re diçe, digere û peyama 'xwe' diyar dike. Ev tişta ku peyvika 'Hermeneutîk' dibêje, ew e: Di wê tişta ku ez dixwînim, fêr dibim, dibêjim an jî hîs dikim de, ev tişta hanê heye ku divê bê diyarkirin: Li vir pêşşertek tune ye. Belkî bêhtir qala wê bê kirin tişt werin ziman ku ziman, fêmiya me yî tiştan e, ji bo em belkî bi arîkariya konstelasyona rast hetta di hedinandina êşan û sînorkirina wan de bi hev bidin fêmkirin, li ser wê tişta ku ew, em in.

Ew, ev e ku min li ba tiştan wisa pirr mijûl dike. Ew wisa ye ku kêfxweşiya serkeftinê, hîn kêfxweşiya herî mezîn a jiyanê ye û ku derfet -ewên di vir de ji bo pêvajoya şifayê heneqet nikarin têr werin nirxandin. Helbet di nav de dibînim ku bê îndûstriya kimyayî dê pirr çeşîdên navgîn û rêbazên tibba modern ne di bin destê me de bin û ku bi vê, tiştên bê dawî têne filitandin. Lê bihêzkirina awayê jiyanê û dîsa vetecrûbekirina jêhatin û serkeftina xwe ya xweser bi riya vê zindîkirinê, ancex ew e ku pirsa mezin a xweser a jiyanê ji êşê dipirse.



Berhevdan

We teswîr kir hevpeyvîna rast û lêhatî çiqas girîng e ku îro hergav bêhtir paş ve diçe. Bifikrin giştPC'yan, computerbûna bi pêş ve diçê ya civaka me ku rê vedikê li vê yekê ku mirov tenê li pêşiya rûxalên bikarhêneran rûdinin, belkî demek nêz karbênin sondayekî ji bo karibin dirêjtir rûniştî bimênin: Gumana we yî di derheqê vê de: Dê çawa geş be ew tişta ku bi taybetî jî di nêrîna li ser zêdebûna giştî ya êşên piştê de tê dîtin?

Gadamer: Pirr spas! Ev pirs, ji min re pirr rast tê. Bi rastî, ez bawer dikim ku em li serdemên dijwar rast tên. Baweriya bi înformatîk û bêkesîtîkirina bi vê re çêdibe, ya ku li ser em diaxivin, muheqqeq ne riya ku ji bo tehekkum, an jî em baştir bêjin, ji bo hostabûn, ji bo hezmkirina êşan pirr arîkar

e. Muheqqeq evana geşedan in ku ji wanan em dikarin fêr bin, ger em tenê ji jiyanê bawer bikin. Ez pirr jidandî qane bûme ku bi wata herî berfereh hene awayên nû yên jiyana veçêbûnên perwerdeyî ku dikarin di dijîtiya cîhana mekîneyan de bên têgihiştin û dê ji vêna encamên pêwist derbixin.

Ger ez we rast fêm dikim, îcar hûn dibêjin: Êş dikare wateyekê jî çêbike, êş dikare bê erêkirin. Lê ger em li geşedanên tibbê (li vir jî, li vê kongreyê) binêrin, îcar em dibînin ku bimeyilî tam dijberê vê yekê dikare bê nîşandan. Em daîmî dibînin û dibihîsin: Em pirr kêm derman, pirr kêm afyon distênin, wek mînak, em hevbêriyên kîloyan serê 100.000 kesî dibihîsin û belkî jî divê em Danîmarka wek mînak bistênin. Esas bê guherîn, em li pey lênêzbûniyekê ne, ku ew e tam dijgera wê tişta ku we got: Li watê jî gerîn di êşê de. Em hewl didin heya dibe bi lez ji kronîfîkasyona êşê xwe vedin û hemî fêl û finasên muhtemel bibînin ji bo em vêna çêbunbar bikin. Vêce li vir ez dijberhatinek kifşkirî dibînim.

Gadamer: Ez we piştrast û teqez dikim. Çi, ku hûn dibêjin ew, wek tê zanîn ev e ku ez dixwazim. Pirs ew e, kî îmkanên rasttir digre û vanan ji bo xwe bi fêde dike. Bi gumana min, pevrejîna bi êşan re pêk naye ji vêna ku ev êş zû biqasî îmkana xwe werin jibîrkirin. Hîn bêhtir, mirov divê hewl bide, ger em wisa bêjin, bi xwe jî karînî bike -bi saya xwedayina xweser a ber bi wê tişta ku kesekî pêk têne- ji bo vêna ku jiyanek ragirî derbas be.

Rasterast ji bo vêna: Mutleq, we rast got ku ew kêfxweşiyek

mezin e, ger mirov karibe êşê bi saya hêza xwe têk bibe. Lê çawa ye rewşa mirovê ku bi vê ser nekeve? Ev ne feqîrbûna mirov û jiyanê ye, ger êş dê ber bi mijarek bi hukm dabigere û mirov nikare vê êşê ji hêza xwe têk bibe? Îcar mirov pêdiviya arîkariya kesekî din nake, ya doktor an jî belkî ya kîmyayê?

Gadamer: Mutleq, ev rewş hene. Wek tê zanîn, pêwistiya tibbek wisa nîqaş nakim. Lê eve, doktor ji tenê kesekî jêhatî, ji amojgerê karzane li wir di rewşa nexweşiyê de, zêdetir e. Ew bi hêz dike tam vêna ku li ser wê, ez wisa axivîm ku bi awayekî mirov ber pê têne; jiyana tê jiyandin. Bi taybetî em deyndarê doktor in, ger doktor ne tenê derman belav bike.

Birêz profesor, we ji ser ve nerî li sed sal şaristaniyê ku di nav de, guhertinên mezin hebûn. Li vir berî her tiştî televizyonê difikirim. Kîjan bêbinîtî di der-vehebûna beşerî de divê werê pêşberî xistin ku ev bêbinîtî dike mirov heya sê saetan rojê li nav navgînek wiha binêre, û ne wisa ye ku ev semptoma civaka me îro nîşan dike ku mekanîzmayên xwe-şıfa û karanîna bi êşan re heya ewqas dejenere û biyanî bûye, ku gotinên we bi rastî pirr hêjayî pêşwaziyê ne, lê eve, pirr ne dûr in, ji realîteyê?

Gadamer: Ev miheqqeq, rast e. Talûka herî mezîn a li dijî malbatê, televizyon e. Televizyon bandorek dike ku mirov di navbera xwe de sihbet nakin. Lê mirov li wê bi sihbetxweşî dinêre. Ew êdî wisa ye, ku di vê wateyê de em li serdemên dijwar rast tên, ji ber ku her tişt bi awayê vê çûnûhatinê tê lêanîn. Li gel vê jî bawer dikim, ku pêwistiya pevfêmxistinê

nikare bê 'derbas kirin', aha wisa wek axaftina serbest. Mirov dê her dem bêjin: Ewka ku min ji xwe re fikiriye ew, wek tê zanîn, bi riya televîzyonê qet nayê hingavtin. Ew cudahiyek mezin e, ku mirovek rasterast li pêşiya min dibîne, an jî li gel min ji ekranê ve diaxive. Ew, pirseke beşdarbûnê ye, parvestandina çalak ber bi Yêdin re ye jî. Ez bawer dikim, em dikarin li vê xalbendê bi aram bin: Ez piştrast im û vêna hîs dikim: Erê, mirov li her deverî mirov in, lê jiyanê li her deverî qest dikin, û ev divê qet ne wê jibîrkirin. Em xwedî hêzên awarte yên di nava xwe de ne ku nikarin winda bin û wisa hêsan biçin; lê doktor li vir xwedî fonksiyoneke maîeutîk [danzayînî] e: Ew, di hişdarbûna ji van hêzan de piştgiriya me dike, lê ev hişdarbûn, bi saya êşê xwe tev çêdike.

Ger em ji gumana we yî li ser sedem û terapiya êşan encaman derxin, îcar ev dê şoreşeke terapiya êşên kronîk wate bike. Em dikarin dermanên êşê deynin aliyekî, enjektôr û tiştên bi vî hawî. Dê pêwist be em esas tenê wêrînekê bidin nexweş ku bi nexweşiyê biqedêne.

Gadamer: Hûn qest dikin, tenê bi arîkariya organîzma tevayî, lê ne bê her arîkariyê; tenê wisa we, ez baş fêm kirim.

Tişta ku we got, vedîtina hêzên xweserî yên Xwe-şifayê ye ku îro di tibba rêftarê de ji aliyê psîkologan ve tê hînkirin. Ev, mijarek girîng a tibbê ye. Mixabin ev, hîn ne bi giştî tê qebûl kirin û hîn nehatiye naskirin ku qismê mezin ê tedawiya êşan tê ji wan hêzên ku mirov bi xwe xwedî wan in. Ravekirinên we di vê navberê de xwedî selefekî girîng in: Berî 420 salan Michel

de Montaigne tiştek pirr dişibe vêna got. Ji ber sedem û esasê êşa kevir û kolîkên gurayî derdiketin, wisa zanîbû ku li ser çi diaxive; balkêş bû, ji hinga ku di çil saliya xwe de wî û êşan bi hev girtibûn, ku gotarên wî yên felsefî pirr gir ji êşê ve tayin kirî bûn. Di ceribandinên xwe de ew her dem li ser êşê fikirî û li wir nivîsandin tecrûbeyên ku wî kirine ji bo êşê têk bibe; pirtûk tev tijî ye bi "fêlên" ku bi wan, mirov dikare êşê ji ser xwe ve bibe. Wisa jî dibêje: "Ger tu, êşa xwe têk nebî, îcar dê êşa te, te têk bibe." Wî negot: "Ger doktorê te, êşa te têk nebe, îcar dê êşa te, te têk bibe", na, wî behsa "tu" dikir, vêce li xwendevan bi xwe raçav dikir. Ez bawer dikim, tişta we gotî, doktrînek pirr girîng e û bi hêz dike psîkologên ku niha vê doktrînê bi zanistî bingeh dikin û dixwazin bînin nav mirovan. Ev gotin, pozîsyona wan xurt dike, lewre we ev tişt anî ziman.

Gadamer: Ez pirr kêfxweş im û îtîraf dikim ku ez Montaigne pirr baş nas dikim. Niha ji aliyê Hans Magnus Enzensberger ve hatiye çapkirin wergerek Almanî pirr xweşik, nû, ku li mala min jî heye. Ew, di vê pirtûkê de li ser nexweşiya bê şifa, mirinê û ecêban radiweste. Vêce, pirr spas ji bo vê rastandinê!

Birêz profesor Gadamer, ji xwe re pêşberî bixin, hûn pênc salan xwedî êşên kronîk in û diçine doktorekî. Hûn ji doktorekî di heyama me de çi hêvî dikin? Hûn ji xwe re doktorekî pirr baş çawa pêşberî dixin? Ji wî, çi bendewariya we heye?

Gadamer: Erê, helbet. Ez ji wî berî her tiştî yekcar hêvî dikim, ku ez karibim xurt bikim hêzên organîzma xwe yî

xweserî ku êşa wê dikare min jî tayîn bike. Ez ji we re îtîraf dikim (û min got wek tê zanîn di konferansa xwe de), ku qaneyên min di vê beşê de pirr bi girîngî deyndarî hevalê min in, Paul Voglerê ji Berlin ku di vê navberê de çûye rahmetê û xwediyê kûrsiyê tedawiya tebîî ya Charité bû. Ez, divê ez vê bêjim, niha bi saya qebûla aqlî ya ku Vogler temsîl dikir, yekemcar pêşî gihame vî emrê sererast. Ev ji bo we, hîn navek e? Paul Vogler, îro kes êdî nas nake! Ne girîng e, kes wî binasin, lewre tişta ku wî hîn kir, dikarê li her deverê bê tecrûbekirin. Berê hebûn dapîr ku li ba tiştên herî piçûk firaxên arîkar û ne her tişt didan. Vogler wisa ji min re vekirin tiştên ku di min de, ji mêj ve bendî vekirina xwe bûn. Vogler bi xwe, gihişte jiyanbariyên xwe li ser fitlonekên ku min di konferensa xwe yî mutewazi de diyar kirin. Wî li cem dapîran - li Frankfurt an der Oder, ger ez ne şaş bim- dest pê kir agahdar bike derheqê ka ew van bezekan çawa tedawî dikin, û piştre hînî van tiştan bû û ravekir, di kîjan payê de, li ba kîjan derfetan û bi kîjan îmkanan ev bi rastî riya serkeftinê vedike. Ew e kevneşop an jî rîwayeta ku zanînê dide destê me. Ev zanîna ku dikare vede tişta ku mirovan di jiyana xwe de tecrûbe kiriye, an jî fêr bûne ji mirovên din, ku piştre mirovan ji aliyê xwe agahdar dikin.

Ez dixwazim tiştek kin hîn bipirsim: Ez ne li dijî Kneippê me, lê çawa divê doktorek, li gor dîtina we, bi nexweşên wisa re mijûl be? Hûnê nikaribin çend mînakên pragmatîk bidin?

Gadamer: Belkî, divê em berî her tiştî mirovan perwerde bikin. Lê qala nexweşan tê kirin, ne wisa zêde qala doktoran.

Ji bendewariya we ve pirr fêmane ye ku hûn dipirsin wisa, û wek tê zanîn, min bersiva we da. Tişta ku min kiriye mijar, rewşa hêjayî gazinê ye ku doktor nikare êdî serbest bilebite, lê li hember, di bin dîktaya îndûstriya mezin, dermansaziya kimyayî disekine û wisa her dem zêdetir dîsa ji bîr dike nexweş bi rastî bigre li wî cihê ku ev dê di berpirsiyariya xweser û di jiyana giştî de bi wate be.

Ez vêna hîs dikim wek pêngav û dermanekî ku we ji me re li vir got û temsîl kir. Di van deh heya pazdeh salên dawî de min , wek tê zanîn, nexweşên bêhejmar ên êşê pirr tedawî kirin. Ji bo van nexweşan êş, her dem navgîn e ku derî an jî dergehê dinyê bigre û ger mirov vî derî bigre, îcar mirov êdî ne xwedî wê îmkanê ye bi vê dinyayê re bi awayekî pirrhêz mijûl be. Û ger ev êdî ne mimkun be, îcar mirov nikare ji bo jiyana xwe bibîne van çawaniyên ku we ji me re nîşan kirin.

Gadamer: Belê, herhal ev e ceribandina herî mezin ku heye.

Ez dibînim ku vequtubandin li vir pirr teng tê kirin. Ez pirr fantastîk dibînim, tişta ku birêz profesor Gadamer li vir dibêje. Lê, parçeyek vêna ye herhal kesîtiyek wisa wek kesîtiyek ku ew bi xwe, teswîr dike. Dîsa jî îtîrazek min heye: Ji bo nexweşê normal ê êşê - em mecbûr bûn vanan bi êşê fêr bin- bi gurayî pîvanên din derbas dibin. Nexweşê êşê yê normal bi saya êşê bi paş ve hatiye avêtin, wisa ku êdî jê naye geş bike van çawaniyên bi fêlrastî ku ew belkî xwediyê wan e, lê divê bi arkariya îndûstriya kîmyayî werê ser xwe, yekem dîsa ewqas ku ew ni-

kare van jêhatiyan geş bike. Ez baş nabînim, wisa bikin wek ku an tenê yekan heye an jî tenê yadinan. Bi arîkariya zanîna li ser şifaya tebîî mirov dikare belkî pirr dermanan danhev bike, berêtir jî, bi saya rêbazên alternatîf bêne wê merhelê. Bi taybetî ji ber ku êşterapî hîn di destpêkê de ye, ez wisa baş nabînim, ger mirov niha her tiştî bi derbeyekê biqulibêne. Mirovê yekane, lawaztir e ji mînakên ku we ji me re bi nav kirin û ji kesên mukemmel bê hevber tên û mixabin mirovên normal teswîr nakin.

Gadamer: Ez bawer dikim, hûn nirxên xwezayê kêm dibînin. Mirov divê ji bîr neke ku derman organîzmayek naxwe tendurist dixwazin.

We di berhevdana xwe yî bi me re - ne di konferansa li pêşiya herkesî xwendinê de- got û bêhtir pirsî: "Çi ye êş, hişyarî ye? bibîrxistin e?" Çi ye êş, ji bo we?

Gadamer: Her du! Ez hêvî dikim, min bi esasî nîşan daye ku mirov dikare astengên pirr mezin biqedêne, ger yek çêbike yêdin bi fêlrastî. Naxwe ez dê herhal ne li vir bim, ger min bi xwe xwestiba jiyanek beredayî biparêzim. Na, ev ji min pirr dûr e.

Birêz profesor Gadamer, em dixwazin bi dil û can spas bikin ku we riya nekêmxîretî ber bi me ve hilbijart û dît jî ku we bi her kesî re berhevda û ji me re riya dîtinek girîng vekir, wisa mirov bêje ku Ez di îfada êşê de xwedî rolekî pirr teybet e. Pirr spas.

Paşgotin

"Le corps est négligé, le >passé sous silence<" [Jînlaş*, serderbasî ye >di bin bêdengiyê de raborî ye<] wisa

* *Le corps* bêjeyek fransî ye ku ne tenê *laş* û *bedena* mirov wate dike, herweha ji bo wergera jînlaşê (Fr.: la chair, Ing.: lived body) hebûna mirovan bi awayekî fenomenolojîk cûda û duwate ye. Têgînzaniya tevgera fenomenolojiya Xerbê rave dike ku ev daneyek di danûstandinên navbera fenomenolojiya li vî û wî aliyê Renê ye. Yek ji îdyomên almanî ye têgîna *Leib* ku ji têgîna *Körper* (laş, beden, cism) vediqete û ji bo tevgera fenomenolojiya Xerbê bi fransî, ingilîzî û hwd. ne hêsan hatiye wergerandin. Peyvika kurdî *Laş* mîna *soma*, *corpus*, *Körper*, *corps* û *body* duwate ye ji ber ku him zindîtiyê him jî nezindîtiyê, bi xwe dide xuya kirin. Bêja tirkî *Vücut* ku ji Erebî hatiye wergirtin, bi awayekî rasterast di kurdiya îro de nayê bikaranîn, her çend mirov dikare vêna di wêja kurdî ya klasîk de bi şêweyê *yekîtiya hebûnê* bibîne. Bêja almanî *Leib* bi jiyanê ve girêdayî ye, wisa ku hin mînak di almaniya kevin de (*lîp*: kes, kesîtî), ya îro de (*Leiben*: jînlaştin, bi qertafa lêkerên ku dawî dibin bi -tin) an jî (*Leben*: Jiyan), û li nêz koka germen ya almanî-ingilîzî (*Life*: jiyan) hene. Di vê deqê de me peyvek nû ne *afirandiye*, lê *pêşniyar* kiriye wek *jînlaş* ku hebekî ji *neologîzm*an dûr e, lê herweha ji hêza goştê kurdî ve, *dane*yek rengîn e; lewre jiyan tê hîs kirin û pêjnandin, ne di laş de, lê *ji seranserî*

dinivîsêne Sartre (1943) di ramanên xwe yî li ser tecrûba beşerî ya jînlaş de. Ji bo liwirbûniya [Dasein'a] mirovan wisa konstîtutîf xuya dike, ku jînlaş di der-vehebûna ["Existenz" ji lêkera latînî "exstare"] rojana de lal dimêne, em dikarin wî ji bîr bikin, bi awayekî di vê rastiyê de temam dibe ku em dikarin ji dinyayê re xwe bidin û di wê de spartekên xwe. Tenduristî dikare bê pênasîn, bi saya ku organ bê deng dibin. Wisa ew xwedî sedemek baş e, ger Gadamer derbarê "veşartîbûna tenduristiyê" diaxive, û wîna hetta ev tespît wek sernavê gotarên xwe yî bijarte yên li ser pirsgirêka lênerîna tenduristiyê û hûnerê hekîmtiyê (Gadamer 1993) hilbijart. Tenduristî ewk e ku xwe der-vedikişêne. Gotina "Tenduristî parçeyekî mucîza Xwe-jibîrkirinê ye" (Gadamer 1993, r. 126) dikare xwejêrî hîn bi awayekî herî nêzîk, wek başbûnê [Wohlsein] bê hîs kirin. Ev veşartîbûna jiyanek tebîî bi mehrûmiyetek jînlaşî êdî nîne, ger mirov here ba doktor û bi awayekî li vê hatî bipirse: "De ka, çî we heye [çi ji we kêm e] ?". Berî vêna di vê başbûnê de xuya dike, wisa wek ku "her tişt" li wir bû. Nexweşî êdî di dijberiya tenduristiyê de xuya dike wek "tişta ku diguvêşe û diarêne mîna çîkekî aciziyê, talûkeyî ku divê bê qedandin" (Gadamer 1993, r. 135) Û di vê guvaştinê de, êş tam li pêş radiweste. Ew e fonksiyona wê di jiyanê de "ku hîsa xwejêrî li aciziyekê di denga lêkirî ya tevgera jiyanê de nîşan dide ku jê, tenduristî pêk te" (Gadamer 1993, r. 139).

Wek kêm "septom"ek din, êş, qebû ji tibba modern dixwaze. Êş "divê bê qedandin". Cerrah Sauerbruch di sala 1936an de wisa nivîsand: "Spartekek tebîî ya doktor, têkoşîna li dijî êşê ye". Niemann (1993) ev hevok, bi pêşveçûnekê şîrove kir

jînlaş ve (durch den Leib hindurch). (-j.w.)

ku helwesta doktor ji bo êşê berfirehî bi saya wênê dijmin û şer diyar e. Dermanên beranber, wisa wek çekên di şerê li dijî nexweşketinê de xuya dikin. Mudaxeleyek somatîk laş wek "res extensa" [tişta divezîle], bedenê pîvanbar şert dike. Zanistî bi jêhatiya xwe yî teknîkî, wisa qest dike Gadamer (1993, r. 163), dikare bibe ser "baweriya, mirov dikare her tiştî bike, wisa wek mînak cerrah dibêje: 'Em vê derxin'". Ji aliyê din, nexweşî û mirin me li ser "sînorên çêkirbariyan" hîn nakin? Û tecrûba êşê di heyberkirina wek semptoma "bûyer"ekê de diqede, ku divê bi lezek îmkanî bê berhewakirin? Dê bi vêna, lê ne ji serî ve bê astengkirin, ku tecrûbe bê kirin, ji bo nexweş çi wate dike nexweşiya ku di êşê de ifadeyekê çêdike? Bê guman êş dikare wek "pêtekek diçewisêne û diperitêne" bi izdirap be. Gadamer (1993, r. 100) li vir vediguhese ji Rilkêyê nexweşê lôsemiyê ku li hemberî "pêteka diçewisêne û diperitêne ya êşê" anî ziman, çawa êş, wî ji wî re biyanî dike: "Ey jiyan, jiyan, li derve bûn". Êş "ji Der û Derve ya mezin, berfireh a dinyatecrûba me yî ber bi nava Hûndir re" vedikişe. Schiltenwolf dide ragihandin ku êş erê her dem ji bo nexweşên pirr û bêhejmar navgînek e "derî û dergehê ber bi dinyayê ve bigre". Û ku ev, yekemcar qewimî, "îcar mirov êdî ne xwedî îmkan e bi vê dinyayê re bi awayekî pirrhêz mijûl be".

Lê di jêgirta Rilke de ji aliyê din heqîqetek giştî ne hatibe bang kirin, wisa dipirse Gadamer, çawa ev heqîqet ji destpêkê ve bi me re heya îro hatiye, mesele di jandîroka mesîhî de, lê dikare ji ser vê re di hemî çandan de werê dîtin, bi dema ku navxweyîkirin bi saya kişandin û ragirtina êşan rast tê? Ma ev "navxweyîkirin" [Verinnerlichung] nîşan nade ku girîngî û nirxa esas a nexweşiyê bi saya "derxistin ango avêtin"ek pir

bilez a nexweşiyê tê beralî kirin? Gadamer (1993, r. 102) li vir dest nîşan dike Viktor von Weizsäckerê ku pê re, wîna çend hevpeyvîn kiribûn; von Weizsäcker her car dipirsî: "Nexweşî ji nexweş re çi dibêje; ne wisa pirr wek: Nexweşî ji doktor re çi dibêje? Bêhtir, nexweşî çi dixwaze ji nexweş re bêje? Dikare ev belkî hetta arîkariya nexweş bike, ger ew fêr be, vê pirsê bipirse?" Von Weizsäcker xwedî rewacek e, wek pêşengê tibba psîkosomatîk.

Daxwaza navendî ya "antropolojiya tibbî" ya Weizsäckerî ew bû, xwejêrê ber bi tibba modern ve bêne. Schiltenwolf ev kevneşopiya Heidelbergî pêş ve bir, ger ew diaxive li ser vê yekê ku nexweş divê wek xwejêr bê gihiştin, divê wek "hevlîstikvan" bê qezenckirin. Ger mirov di cî da û radîkal bi dermanan di bûyera nexweşketinek psîkosomatîk a êşê de mûdaxele bike, herhal nexweş êdî ne xwedî derfet e, kar û hal bike pirsgirêkên psîşîk ango psîkososyal ku li vir belkî bi tişta organîk ve bêne şemitandin. Wek tê zanîn, vedîtina mezin a psîkoterapiya modern ew bû, derbixe holê ku semptomên ruhî ango bedenî dikarin xwedî wate bin, dikarin di riya liwirbûniya kesê mûteessîr wek qewimînek bi pirrwate bên fêmkirin, dikarin di pevçûn û barên kifş, psîkososyal de bi bingeh bin.

Nexweşeke êşê, Elisabeth von R., yek ji nexweşên herî peşî bû, ku analîz û terapiya wan bûne rênîşander ji bo psîkoterapiya modern. Dema ku ew çû ba Sigmund Freud, gazin dikir derheqê êşên giran ên di paqan de ku pêçûna wê roj bi roj bêhtir bê îmkan dikirin. Êdî rewş çawa bû, dema ku van êşana cara yekem xwe dan xuyakirin? Bi dayik, xwîşka giran nexweş û zavayê xwe re Elisabeth li tetîla havînî bû.

Elisabeth bi xwe, ji zavayê xwe hez dikir, bêyî ku wê ev tişt îtîraf kiribe; lewre ew bi xwîşka xwe ve pirr pêvebûyî bû. Berî derketina nexweşiyê êdî, rasterast du rewş hebûn. Di gereke ji bo sê kes plankirî de nikarîbû xwîşka wê ji ber nexweşketina xwe bi wan re be, wisa ku Elisabeth, bi zavayê "berdilk" tenê bû. "... Wê xwe, wisa pirr levhatî dît, bi her tiştê ku wî digot, û xwesteka be xwediyê zilamekî ku bitişbe wî, di nava wê de kete rewşek li ser hêza wê". Demek kin piştre xuya kirin gazinên ku bi gurayî xurt dibûn, dema ku ew li ser doşeka xwîşka rehmetî bû, li nav serê wê ev raman derbas dibû: "Niha ew êdî azad e, û tu dikarî bibî jina wî". Li vir ev pevçûna hanê heye: "Ew dorhêleka erotîk a pêşberîxistinê ye ku bi hemî pêşberîxistinên exlaqî re pevdiçe, lewre meyl, bi awayê wê re pêwend e, û him di emrê wê de him jî piştî mirina xwîşka wê ramanek ne bêqebûlkirin bû, ku ew divê niha bêriya wî mêrkî bike". Derketina septomê divê êdî wisa bê daxuyanî kirin, ku "ji dêvla êşên ruhî (ku pevçûna di nava wê de bûye sedem)", ku wê ji xwe re kom kirine (êşên ruhî, mîna tev pevçûnê jî mabûn nehişîn [unbewusst] bi qismekî mezin), niha ev êş, bi awayekî "bedenî" derketin. "Wisa hat dest pê kirin dagerînek ("Konversion") ku li ba wê derket hole wek qezencek ku nexweş xwe ji rewşek neragirî, psîşîk vekişandibû, lê herweha berdêla ... janek bedenî, ya êşen" ku bûn sedema jênehatiya pêçûne (Freud û Breuer 1895).

Arîkarî li vir bê îmkan bû, bi saya ku piştbingeha beranber, ku bûbû sedema vê êşseptomê, hate hewl dan û xebat kirin. Bi Shakespeare re dikare li vir bê gotin: "Gotinan bide êşa xwe: "Kerba ku neaxive, diguvêşe dilê tijî, heya ku bişke"(brh. Lang 2000b). Hevpeyvîna, ku li vir di navbera

Freud û nexweşê de geş bûbû, xwe wek terapî bi saya "hêza şifaanîniyî ya peyvê"(Gadamer 1993, r. 173) dabû xuya kirin.

Êşa psîkosomatîk dikare di ve navberê de derkeve ne tenê bi riya mekanîzma li vir hatiye ber çavan ya dagerinê, lê herweha wek hevpêwendek psîkovejetatîf ango hevtayiyek.

Tirs wek diyardeyek ku li her deverî tê dîtin, dikare ji wêneyên curbecur klînîk ên dîdar rê veke ber bi rewşên vejetatîf yên vekêşaniyê ku îcar wek hevpêwend wêneyê klînîk tayîn dike. Ev "somatîzasyon"a ku derdikeve rê ji bûyêrên pêvajoyî yên psîkolojîk ku ewane wisa bi hesta tirsê diçin, ku tirs bi xwe di hişê mirovê mûteessîr de winda dibe. Îcar em êdî nikarin li ser hevpêwenda tirsê biaxivin, lê li ser hevtayiyeke tirsê. Ne kêm dikarin wek mînak êşên serî li ser vî bingehê patopsîkolojîk ango patofîzyolojîk (bhv. Ahrens û Egle 1993) bên daxuyandin.

Ne kêmtir dikare kelemek wisa psîkovejetatîf a êşê dorhêla depresîf a şêweyan pêwend bike û li vir bi taybetî di wata hevtayiya hestan gava ku septoma bedenî, ango êşa laş, "temsîl dike" hesta depresîf ku bi xwe an jî tenê pirr kêm têderxistî ye. Ji ber vê yekê mirov dikare li ser "depresyona nixumandî"(bhv. 2000a) biaxive. Li vir dê ji bo doktorekî pêwist be faktorên dibine sedema depresyonê tayin bike, psîkodînamîkek a depresyona "bi êşê ve girêdayî" vekole. Êşên fantomê dikarin hinekî berfirehtir belkî bi vî awayî bên fêmkirin. Mînakek a Niemann dikare vê tiştpêwendê [Sachverhalt] destnîşan bike:

"Nexweşeke 48 salî tê tedawiya li ser lingan bi êşeke fantomê, û di anamnêzê de xuya dike wisa wek ku xemgîniya li ser windakirina paqê, li cem êşên vegotine wek tîpîk rolek

dilîze. Nexweşê pêşî hinek eleqe ji bo pirsdayînê da xuya kirin û wata windakirinê negirîng dikir- Terapîstê êşê, vê negirîngkirinê fêm dike wek îşaretek di derheqe vê yêkê de ku nexweşê nikare tevahî ber bi aliyê hîssî yê êşa xwe biçe. Terapîstê eşê ji ber vê yekê, pêşî ji nexweşê re tedawiyek bi derman pêşniyar dike, lê destnîşan dike ku mijara windakirinê herhal hîn vekirî ye. Bi saya serkeftinên terapiya bi derman û asêbûna hîssî ya pêwendiya nexweş û doktor ew, ji nexweş re hêsantir dibe, hercar ji aliyê doktor ve dest bide mijara pêşkeşkirî. Wisa bi rastî ji bo demekê derdikeve rewşek ku tê de bi rastî, nexweşê êşdaxistî ye, lê herweha bi şiddet ji aliyê ruhî êrîşkirî ye û bi awayekî psîkovejetatîf bêaramî ye. Serkarkirina 'hizn'ê, bi tepariya dermanî ya domdike re di nava pênç heyvên (li ba tev 12 muayeneyên doktor) kêmkirineke sekînî ya semptomê dor % 80yî (li gor analog skala ya vîzûel)" bi îmkan dike.

"Dîmenê eslî yê jiyanê dikare di êşê de bê pêjinandin"- ev mînaka binavkirî ya bûyerê, vê hevoka Gadamer diresmêne, ger ew aliyê dervehebûnî-kesîtî ya jiyanbarî ya êşê bide xuya kirin. Li ser jiyanbariya, li ser "hedinandina êşan û sînorkirina wan" em dikarin bi hev fêm bixin di derheqê vê tiştê de ku em çi ne. Çawa herhal kêm li ba diyardeyek din, jiyan wek ya me, xwejêrîtiya beşerî-fanî ya me di êşê de tê nêzî me. Sigmund Freud ê nexweşê kanserê, roja 19a Adara 1926an ji hevkarê xwe yî psîkanalîtîk Eitingon re, rûbirû mayî bi bêçarî bê dermaniyek pêkan bi êş û mirokî dinivîsêne: "Ku mirov dikare hêvîdarî tiştekî ne rewa be, hema yekser ji ber ku ew ya herî muhtemel e, kes naxwaze bawer bike. Ji xwe re pêşberîxistinên şaş çênekin êdî û bawer nekin ku ez di depres-

yonê de me. Ez di vê de serfirazî û serkeftinekê dibînim, ger mirov hukma xwe yî zelal di bin her şertî de mihafeze bike". Hukma zelal, ev e nirxa ku pê ve, Freud heya dawîn girêdayî bû. Bersiva wî ya ji bo qewîtiya doktoran dermanên êş û aramdariyê rêjeyek mezin bistêne, ji ber ku êş û bêxewiya bi saya vana çêbûyî rewşa wî xerab dike, ev bû: "Ku ez dixwazim di nav êşan de bifikrim, baştir e ji vê yekê, ku ez nikarîbim bi zelalî bifikrim"(bhv. Lang 2000a).

Di dema êşa şertdarî akut û organîk de, helbet divê mirov bal û dêhnê xwe bide fonksiyona têderxistekê û hişyariyê. Di dema êşa kronîk de jî dikare qala fonksiyonek biyolojîk girîng a hişyariyê bê kirin, lê êş dikare "vala bigere", wek mînak di mesela binavkirî ya nexweşê bi êşen fantomê de, an jî di hemî gazinên ku yekemcar bi awayekî "organîk" bingehkirî ne, lê ev bingeh êdî ne danî ye, û tevî vêna, êşan daîmî dikin. Îcar gihînek bi tevayî pêwist e, ku ew li nik aliyê organîk bal dide aliyê psîkososyal jî. Çiqas pirr aliyê xwejêrî psîkososyal dikare li jiyanbariya êşê di tibba me yî modern de bandor bike, bandora plazebo, bi tana serê xwe dide xuya kirin. (bhv. Lang û Faller 1998). An jî, bînin bîra xwe leşkerên birîndar ku bi xwe kêm gazin dikirin li ser êşên xwe, dema ku birîndariya wan, serbestberdanek ji qada şer (Beecher 1959) pêwist dikir. Leşkerên Amerîkî yên şerê yekemîn ê cîhanê ku li eniya çiyayê Alpan hêwirandî bûn, bi beranberî li ser "million-dollar-wound" diaxivîn. Bûyerek bêhtir beravajiyê vê, dikare hebe, ger nexweş -çawa xwe da xuya kirin di proja me yî Heidelbergî de (Seemann u. Lang 1991 a û b.)- nikaribin tirsa xwe derxin holê û ji dêvla vê jiyanbariya xwe derdixin pêş û wisa ciddî dikin ku êş dadigere ber bi hevpêwenda tirsê.

Di vê lênêzbûniya berfireh ku Gadamer dixwaze de, dê bi heman şêweyê, dîmenê civakî ango çandî yê jiyanbariya beşerî ya êşê werê hesibandin. Li vir têne pêş dayin, şemayên şîrove û watekirinê ku jiyanbariya êşa ferdî bi tenê pêdişwênin û li pejirandina êşan têkar dike. Êş wek siza, gûneh, wek azmûn û hwd. modelên belavbûyî yên şîrova çanda Xerbê (hbv. Lang û Faller 1998) bûn. "Parastina êşê" ya Gadamer dibe ku şaş bike, Stoa'yan bi bîr bixe, lê qey wek ku ji bo wîna naye qal kirin ji navxweyî destnedabe, mîna ev qewîtiya têgînên "Apatheia"[guhnedarî] û "Ataraxia"[hedinîtî] dikin. Bêhtir ew herhal wek selefê xwe yî li kûrsiyê Heidelbergê difikre. Di cildê duyem ê pirtûka xwe "Philosophie"de, bi sernivîsa "Existenzerhellung" Karl Jaspers pêşî du helwestên mirov li dijberî janê dibêje: Ji milkî ve ew dê di wata tibba modern de têkoşîn bike, ji milkê din ve, rê bide êşê û wek mînak wê înkar bike. Di proja berî niha binavkirî ya kanserê ya beşa min î kevn î Heidelbergî wisa xwe da xuya kirin, ku nexweş hewl didin êşên têderxistî li sedemek dintir bar bikin ji nexweşketina bi kanserê û ji ber vê yekê tercîh dikin li hemberî doktoran li ser van êşên beranberî bê deng bin, ji bo karibin îmkaniya "attrîbûsyona bê tehlûka ya sedeman" mihafeze bikin.

Ji van her du helwestan dikare wek veqetandin îmkana sêyem "şiyarkirina dervehebûniyê bi saya janê" bingehîn be: "Di sînorrewşê de yekem, dikare jan bi şêweyekî jênerevîn hebe. Niha ez jana xwe rahildim wek parçeyê bi min bû ye, gazin dikim, bi rastî û ji dil êş dikşênim, ji xwe bi xwe xefk nakim, di vekêşana nekarîna-erê-gotinê de dawîn dijîm, li dijî janê şer dikim, bi sînor bikim, paş bixim, lê ez xwediyê

Jaspers, K. (1932): *Philosophie II - Existenzerhellung.* Berlin, Heidelberg, New York ⁴1973: Springer.

Lang, H., Faller H. (1998): *Medizinische Psychologie und Soziologie.* Berlin, Heidelberg, New York: Springer.

Niemann, U. (1993): *Ethische und theologische Aspekte des Schmerzes,* li: Zenz, M., Jurna, I.: (Brhk.): *Lehrbuch der Schmerztherapie.* Stuttgart: Wissenschaftliche Verlagsgesellschaft .

Sartre, J. -P. (1943): *Das Sein und das Nichts.* Hamburg 1972: Rowohlt.

Sauerbruch, F., Wenke, H. (1936): *Wesen und Bedeutung des Schmerzes.* Berlin: Springer.

Seemann, H., Lang, H. (1991a): *Coping with Cancer pain,* li: Senn, H.-K., Glaus A. (Brhk.) *Supportive Care in Cancer Patients II.* Berlin Heidelberg New York: Springer.

Seemann, H., Lang, H. (1991): *Tumorschmerzen aus psychologischer Sicht: Probleme und Bewältigung,* li: Schwarz, R., Zettl, S. (Brhk.): *Psychosoziale Krebsnachsorge in Deutschland. Psychosoziale Onkologie,* Bd. 1. Heidelberg: Verlag für Medizin.

AĞRI.

Doğduğu 20. yüzyılı baştan sona yaşayan Hans-Georg Gadamer'in felsefi hermeneutiği, elbette metinler ve akademik hayat ile sınırlı değildir, aksine disiplinleri aşan karakterinden dolayı anlama felsefesi, yaşamın bizzat kendisiyle ilgilenir. Bu ilginin odak noktalarından birisi de, sağlık ve sağlığın eksiltip uzaklaşması olarak ağrılı yaşamdır.

HANS-GEORG GADAMER

BİR TEMEL FENOMENE DAİR TIBBİ, FELSEFİ VE TERAPÖTİK DEĞERLENDİRMELER

Hans-Georg Gadamer

Heidelberg Üniversitesi Tıp Fakültesi Ortopedi Kliniği'nce 11 Kasım 2000 tarihinde düzenlenen "Ağrılar" konulu konferans, farklı görüş açılarını bir araya getirdi. Konferanstaki felsefi provokasyon, ağrıyı ömür boyu ödev olarak belirliyordu.Bu konferans metninde Gadamer'in serbest, canlı konuşması olarak söyleşisi, "ağrı" fenomenine tıbbi ve terapötik açıdan yaklaşan fikirlerle buluşur ki acı çek[tir]en yaşam, işte disiplinlerarası bağlamda sadece farklı yorumlara varmaz, aynı zamanda birlikte-yaşama-dünyalarının farklı dillerine gelir, tıpkı benzeştirici zihniyetten sıyrılıp yaşamın bedensel ağrılarını hayatın vücutsal sızısına şimdi farklı akıtan şu iki, akrabalık bağı uzak, ama komşu dilde olduğu gibi.

μεταβολή avesta

AĞRI. EŞ. HANS-GEORG GADAMER

EŞ

Hermeneutika teleefî ya Hans-Georg Gadamerê ku di destpêka sedsala bîstan de gêbûye û ew seranser jiyê, helbet ne bendkirî ye bi metnan û jiyana akademik ve, lê felsefa temkirinê ji her karakterê xwe yî ji ser disiplînan re, bi jiyanê bi xwe re têkildar e.

Yek jî
xalên vê nivenda tekildarbûne
ye tendurstî û jiyana bi êş wek der-
vekişandina tendurstiyê. Konferansa li ser "Êşan",
ku hatiye lidarxistin roja 11ê Mijdara 2000an ji aliye
Klînika Ortopedî ya Fakûlta Tibbê ya Zaninghena Heidelberg,
gûseyên cuda yên dîtinan anîn ba hev. Provokasyona li
konferanse, êş weke sparteka dafirtayîn dikir. Hevpeyvîna Gadamer

NIRXANDINÊN TIBBÎ, FELSEFÎ Û TERAPÖTIK
LI SER DIYARDEYEKE BINGEHÎN

HANS-GEORG GADAMER

wek axaftina wî ya serbest û zindî di vê metnê konferanse de rast tê li
ziman bi lênêzdbûnyek ji goseya tibbî û terapötîk ber bi diyardeya
Êş'ê ve, ku jiyana jianbar eve di benda navdisîplînîye de ne tenê digihe
gihorîyên cuda, lê herweha tê zimanên dinyayên-pevrejîne, mîna
wan her du zimanên dûr ji girêka mervatiyê, lê cîran ku vedikişin
ji zîniyeta mînander û neha jevcihê didine herikandin êşên
cedeni yên jiyanê ji jana jînlaşê heyatê re.

20543 AOC

μεταβολή avesta